

Pirtûkên Ocalan di fûarê de ne

■ Îsal di fûara pirtûkan a Navneteweyî ya Qahîreyê de gelek pirtûkên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hatin pêşkêşkirin. Fûara ku pirtûkên Ocalan jî tê de tîn pêşkêşkirin, li Rojhilata Navîn yek ji fûarên herî girîng e.

Ji 13 welatan dê bo Ocalan bimeşin

Ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, dê ji 13 welatan 70 kes ji Luksemburgê heta Strasbourgê bimeşin

● Meşa dirêj a bi dirûşma "Ji Ocalan re azadî, ji Kurdistanê re statu" tê lidarxistin. Meş dê roja 1'ê Sibatê li ber Dîwana Edaletê ya Ewropayê ya li Luksemburgê bi daxuyaniyeke çapemeniyê dest pê bike û 10 rojan dewam bike... RÛPEL - 6

Li Swîsreyê amadekariya meşa dirêj

■ Li Swîsreyê bi şî-yara 'Ji Ocalan re azadî, ji Kurdistanê re statu' dê meşeke dirêj a 3 rojan bê lidarxistin. Meş dê di 2'yê sibatê de dest pê bike... RÛPEL - 6

Medya

30 Çile Duşem 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 81



Ji bo NA'yê sedem pir in

Gel ji bo ku hesab ji faşîzma AKP'ê bipirse dê di referandûmê de bibêje 'na'. Her roj wekîlên HDP'ê tîn binçavkirin û duh jî Ayhan Bîlgen binçav kirin

JI YEKZIMANÎ Û YEKZILAMIYÊ RE NA

Di serdema hikûmetên AKP'ê de binpêkirinên mafan gi-haşt asta herî jor û gel ji bo hesabê faşîzmê ji AKP'ê bipirse dê di referandûmê de ji dîktatoriya Tayyîp Erdogan re bibêje 'na'. Gelê Êlihê diyar kir ku dê di referandûmê de bibêje 'na'. Li Êlihê jinan da zanîn ku dê li hemberî pergala yekziman, yekrêveberî û yekzilanî tê bikoşin. Her wiha bang li hemû kurdan kirin ku ji faşîzmê re bibêjin 'na'.

ASÛRÎ Û KELDANÎ JÎ DIBÊJIN NA

Roj bi roj bertek û helwestên li hemberî hewldana guhertina rejîma Tirkîyeyê ya MHP-AKP'ê zêde dibin. Koçyîgît destnîşan kir ku ji bo helwesta wan a di referandûmê de bi hezaran sedemên wan ên 'na'yê hene û diyar kir ku dê pergala zordestiyê red bikin. Sazî û rêx-istinên asûrî-suryanî bang kir ku di referandûma rejîma dîktatoriyê ya Tirkîyeyê de dengê 'na' bi kar bînin... R-7



Cenazeyê Ozevlî hat definkirin

■ Endamê Meclisa Şaredariya Serayê yê DBP'ê Burhan Ozevlî, dema ji bo karekê Ji Wanê çû Gurgumê û venegeriya, di wesayîta xwe de mirî hat dîtin. Cenazeyê Ozevlî, bi konvoyeke ku ji sedan maşîneyan pêk dihat, birin gund û li gund bi duayan hate definkirin...

Medya Rûpel - 3



Li girtîgehan provokasyon

■ Piştî îlankirina OHAL'ê binçavkirin û girtin zêde bûn. Li Girtîgeha Tîpa F a Edîrneyê, ji 17'ê çileyê û vir ve girtî di greva birçibûnê de ne. Rêveberiya girtîgehê bi serde-girtin, heqaret û sixêfan dixwaze girtiyan provoke bike. Her wiha li Wanê endamên cemaetê xistin nav girtiyan siyasî...

Medya Rûpel - 6/3



Xeyala derhênera kurd didome

■ Fîlmê 'Drom vidare' (Xeyala xwe bidomîne) ya derhênera jin a kurd Rojda Şekersoz, di 40'emîn Mîhrîcana Fîlman a Goteborgê de, wek namzeta xelata mezin a 'Dragon Award Best Nordic Film' ku wek 'Xelata Ejederha' tê naskirin, hat nişandan...

Medya Rûpel - 9



Xebatên wekîlan asteng dîkin

■ Beriya referandûma guhertina makeqanûnê zextên li hem-berî siyasîmedarên kurd zêde dibin. Bi fermana AKP'ê 11 wekîlên HDP'î girtî ne û her roj parla-menterên HDP'ê tîn binçavkirin.

■ Herî dawî berdevkê HDP'ê Ayhan Bîlgen û wekîlê HDP'ê yê Amedê Altan Tan hatin binçavkirin. Bi daxwaza girtî-inê Bîlgen sewqî dadgehê kirin. Navenda Giştî ya HDP'ê bi daxuyaniyekê bertek nişanî binçavkirinan da... RÛPEL - 7

> Qedera Erdogan di destê kurdan de ye... Nivîsa Mihyeddîn Melko ...

R7

JIN JI BO NA'YÊ LI SER PÊYAN IN Divê baş were vegotin

Jinên ji pergala serokatîyê re dibêjin 'na' got nabe ku qedera vî welatî bikeve destê kesekî



● Jinên ji pergala serokatîyê re dibêjin 'na' ji bo ku azadiya xwe biparêzin li qadan in. Jinan wiha got: "Ji ber ku azadiya me jinan tune tê hesi-bandin, em dibêjin 'na'. Divê mirov ji her kesî re vê yekê baş ve-bêje." Her wiha jin ji bo amedakariyên 8'ê Adarê li Stenbolê li hev civiyan... R.2

HDP sibê li Amedê dicive

■ Bi armanca nirxandina girtin û binçavkirina parla-menterên û diyarkirina rêbaza xebatên referandûmê, koma Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) dê li Amedê civînekê li dar bixe... R-7





Qeyûm xebatan asteng dikan

30 Çile 2017 Duşem

GELEK HEVŞAREDAREN DBP'î bi OHAL'ê re bi derxistina KHK'yan hatin girtin û ji peywirê hatin girtin. Her wiha li gelek şaredariyan jî qeyûm hat tayînkirin û bi qeyûman re xebatên şaredariyên DBP'ê jî hatin rawestandin. Qeyûmê tayîni şaredariya bajarê mezin a Wanê hat kirin û Serokatiya Daîreya Polîtîkayên Jinan girt û piştî wê jî Midûriyeta Xizmetên Jinan a Şaredariya Îpekîyolê hat girtin. Hevşaredar Aygul Bîdav û Veysel Keser jî peywirê hatin dîrxistin û destpêkê cigirê wafî Onder Can hat tayînkirin û piştî jî qeymeqamê navçeya Buharkent a Aydinê Cemîl Oztürk hat tayînkirin. Şaredariya Îpekîyolê îmze avêt gelek projeyan lê bi hatina qeyûm re ev tenê wek proje man. Şaredariyê berê îmze avêtibûn binê gelek proje û xebatên girîng lê belê bi qeyûm re hemû hatin astengkirin. **WAN - ŞÛJIN**



Qedera welatekî nedin destê kesekî

Jinên ji pergala serokatîyê re dibêjin 'na' da zanîn ku nabe ku qedera welatekî bikeve destê kesekî û destnîşan kir ku divê ji her kesî re ev yek baş bê vegotin û bi taybet jî ji bo jinan

Jinên ji pergala serokatîyê re dibêjin 'na' ji bo ku azadiya xwe biparêzin li qadan in. Jinan bi gotinên 'kesayet û azadiya ku me qezenc kiriye nabe em winda bikin' bal kişand ser geşedanan û got ku divê qedera vî welatî nedin destê kesekî. Jina bi navê Fehîma Bîldîrîci diyar kir ku dixwazin azadiya wan ji destê wan bigirin û wiha got: "Ji ber wê em tê dikoşin. Em ji bo rizgariya Tirkîyeyê dixebitin. Gelek kesan jiyana xwe ji dest da. Aborî serobino bûye. Ciwan betal man. Ev kes hîna jî rabûye dibêje ez dibim serokdewlet. Yanî dema osmaniyan tîne û xelîfetiye bike." Bîldîrîci anî ziman ku li Çanakaleyê kurd, tirk, ermenî mil bi mil xebitîne, ew îxanetê li wan nakin û wiha axivî: "Niha em tirk, kurd, ermenî, CHP, HDP û AKP bi hev re dijîn. Em li vî welatî dijîn. Lê niha dixwazin hemû nîrxan tune bikin û şerîatê bînin."

Jina bi navê Olcay Akçay jî da zanîn ku pergala serokatîyê ne pergaleke li gorî wan e û ev tişt anî ziman: "Em komarparêz in, em ê heta dawiyê komarê biparêzin. Pergala wan a padişahiye ye. Dema îstîbdatê



ye. Wek wê ye. Bi serokatîyê re tu eleqeya wê tune ye."

Kubra Ersoy jî bertek nîşanî anîna pergala serokdewletiyê

da û destnîşan kir ku ew li dijî pergala yekzîlamî ye û komarparêz e û got ku dê ji guherîna makeqanûna nû re bibêje 'na'. Gul Sokmen ragihand ku ma ji bo kesekî serokatî tê dayîn û ev tişt ragihand: "Qedera vî welatî mirov nikare bide destê kesekî. Ji ber ku azadiya me jinan tune tê hesibandin em ê bibêjin 'na'. Divê mirov ji her kesî re wê yekê baş vebêje. Bi taybet jî ji bo jinan divê ev yek baş were vegotin." **STENBOL - ŞÛJIN**

Dê di 8'ê Adarê de xebat ji bo 'na'yê bê meşandin

KOMA PÊŞLÊGIRTINA LEZGÎN a li Dijî Cînayetên Jinan, beriya pêvajoya 8'ê Adarê jî bo ku bi birêxistibûneke xurt 8'ê Adarê pêşwazî bikin bi dirûşma "Hûn jî rêxistineke xurt a kampanyaya jinan re dibêjin erê?" civîn pêk anî. Jinan ji bo çawa pêvajoya 8'ê Adarê bi rêxistin bikin, li Salona Civînê ya Cezayirê civîn pêk anî. Jinan di civînê de ji bo ku bi hêz û rêxistin 8'ê Adarê pêşwazî bikin fikrên xwe parve kirin û nîqaşên plan û bernameyan meşandin. Beriya sînevîzyonê pankarta "Beriya 8'ê Adarê jin bêtir bi hêz in! Ji venêrîna

jiyana me re #HAYIR" (NA) vekirin. Di civînê de Jinên Gokuşağı, Federasyona Komeleyên Jinên Tirkîyeyê Navenda Bêtundiye, Femin-Amfî, Partiya Yeşil Sol, Jinên Elewî, Hewldana Jinan a ji bo Aştiyê, (BIKG), Jinên Anarşîst û gelek nûneren saziyên jinan amade bûn. Jinan di civînê de beriya 8'ê Adarê û referandûm jî nîqaş kir. Jinan diyar kir ku gotîna na dê dirûşma herî girîng a 8'ê Adarê be. Jinan anî ziman ku ne tenê li Stenbolê dê li hemû Tirkîyeyê beriya 8'ê Adarê hevdîtineke mezin a jinan pêk bê. **STENBOL - DÎHABER**



Xwe diparêzin û bi rêxistin dikan

Canê xwe feda kirin

JINA BI NAVÊ Xatûn Simaîl destnîşan kir ku ew ji gundê Tilezêr yê girêdayî Şengalê ye û ev tişt anî ziman: "Di rojên fermanê de gel tev berê xwe da çiyayê Şengalê. Hinek dereng ji malê xwe derketin û ew ketin destê DAIS'ê. Du kurmamên min di roja fermanê de ketin destê DAIS'ê. Min bi çavê xwe dît ku DAIS'ê serê dayîkekê jê kiribû û zarokê wê bi saxî li ber serê wê danîbûn. Ew zarok biçûk bû, nedikarî bimeşe û xwe xilas bike. Em ji Tilezar heta serê çiyayê Şengalê meşîyan. Me zarokên mirî li ber teht û zinaran didîtin. Pîr û kalên ne nedikarî xwe xilas bikin, DAIS'ê ew henû qetîl kirin. Hevalan bi fedayî pêşî li fermanê girt."



Di 3'yê Tebaxa 2014'an de çeteyên DAIS'ê êrişî Şengalê kir û bi hezaran êzîdî qetîl kirin, bi hezaran jin jî dîl girtin û li bazarên hatin firotin. Gelek jinên di destê çeteyan de man jî rastî pêkanînên dijîmîrovî hatin û hinek ji wan rizgar bûn. Jinên ku ji êrişên çeteyên DAIS'ê xwe rizgar kir, keliyên fermanê vegotin. Jinan diyar kir ku wan piştî fermanê xwe bi rêxistin kiriye û parastina xwe pêk tînin.

Jina êzîdî Şêrîn Îsa anî ziman ku ew gelek êşên mezin kêşaye û diyar kir ku 12 rojan ew li şikaftan têkoşîna jîyanê da. Şêrîn Îsa da zanîn ku ne xwarin hebû ew bixwin, ne jî av hebû vexwin û wiha got: "Bi rojan em meşiyabûn heya em gihastin şikeftê. Tiştê herî bi êş ku min jiya di rojên fermanê de, şîrê min nebû ku ez bidim zarokê xwe min hêstirê çavê xwe dixist devê zarokê xwe. Ji bo ku nemire. Zarok xwas li çiyê dimeşîyan, tiliyê zarokan xwîn jê dihat. Bi dehan jinan xwe kuşt ji bo ku nekevin destê dijmin. Pêşmerge revîyan û

Şengal ji çeteyan re hişt. Zarok, pîr, kal, li ber zinaran ji nêza û tînan mirin. Piştî rojekê me dît ku heval bi hawara me de hatin û em jî fermanê rizgar kirin."

Jina bi navê Heyat Qasim jî da zanîn ku di dema êrişê çeteyên DAIS'ê de ew ji malê derketine û wiha axivî: "Em di geliyê Derasê de derketin serê çiya. Malbata me bîst kes bûn. Neh roja em di geli de man. Sê zarokê min hebûn û ez ducanî bûm, di nava şert û mercên zehmet de zarokê min hat dinê. Çar roj xwarin nebû ku em bidin wî. Tenê me şekir û av didayê, da ku ew zarok nemir e. Di roja fermanê de hêviyê me jî jîyanê qut bûbû. Em derketin serê çiya, em gihastin Çilmêra, me dît ku heval hatin alîkariya me bikin. Hevalên jin jî tevî rext û çeka xwe hatibûn pêşiya me. Wê demê me fêhm kir ku jin dikare çek rake û şerê dijmin bike. Piştî ku me heval dîtî, me navê zarokê xwe kir Ocalan." **ŞENGAL**

Em ê têkoşîna xwe bidomînin, da kujer bêne darizandin

MIZGÎN ELÎ / KOBANÊ - ANHA

Dadgeha Parisê doza kuştina her sê têkoşerên kurd Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez bêtir ku bigihîje encamê dabû rawestandin. Der barê mijarê de hevseroka TEV-DEM ê Eyşe Efendî banga bilindkirina têkoşînê li gelê kurd kir, da kujer bê nas-kirin û darizandin. Eyşe Efendî da zanîn ku di encama lêkolînan de diyar bû ku ev komujî bi destê îstixbaratên Tirkîyeyê pêk hatiye û ev tişt anî ziman: "Ji ber wê sedemê rayedarên Fransayê ev doz daye rawestandin. Di encama hevpeymanê di navbera Paris û Enqereyê de, kesê bi navê Omer Guney her sê têkoşerên kurd şehîd xistin." Eyşe banga bilindkirina têkoşînê li jinan û tevahiya gelê kurd kir ji bo ku doz ji nû ve were vekirin û kujer bînin darizandin.



Kurbe

Di helbesta Mueyed Teyîb de rastî gotineke wiha hatin: "Kurbe." Hozan wateya wê gotinê wiha nivîsandîye: "Ava mirî, tenê beq tê de dijin." Em dibînin ku çawa rûbar, kanî û çemên delodîn hene, ava mirî yanî 'kurbe' jî heye. Yanî xweza jî wekî mirovahiye ye, zelalî û qirêjî, herikbarî û genîbûnî di wê de jî heye. Jixwe navê hin golan jî golgenî ye. Her hal kes jî me naxwaze bibe kurbe yan jî avgenî. Mîrov jî çi hez dike dixwaze wekî wê be; em ên ku jî ava zelal û rûbarên hevalhez hez dikin, dibe ku bixwazin bibin kurbe? Na. Lê dema ku hozan behsa wê mijarê kiriye, helbet li hin tiştan fikiriye yan jî dîtine. Belkî wî bi hozanî û helbesta xwe bi kurbe û beqên wan re şer kiriye yan na dê çima wiha bala me bikişanda ser?

Bêyî ku dirêj bikim derbasi eywana pîrsekê bibim: Şerê me û kurbeyan çawa diçe gelo, yan em dihelîn ku kurbe di şexsiyeta me de çêbin û

ava zelal û pak genî bibe? An jî dema em ber bi kûrahiya welatê xwe yê hundirîn ve diçin, rastî kurbeyan tînin? Ger jîyan bi kurbe be, giyan jî welê ye. Yan jî ger giyan wisa be, jîyan jî wisa dibe. Loma ye ku ramyarên tesewufê jî gerê

xwe, bi xwe re dikin û jî wê yekê re dibêjin "cîhadul ekber" (şerê mezin). Mîrov herî pir ji xwe re xencer e, jî xwe re dilkoçer. Gerçî mutesewuf şerê mezin wek "Şerê li hemberî nefse" dinirxînin loma jî ez bi hevoka xwe ya dawîn jî wê şîroveyê dîr ketim lê jixwe armanca min ne ew e ku li ser 'cîhadul ekber' binivîsim lew di wê mijarê de jî her kes bersûc, govan (şahîd) û dadgera/ê xwe ye.

Ji diwana hozan ev her du rîstê jî di nav lênûska min de lîs bûne: "Bihêle heyv etegê şevê bîr" ya din: "Welatê min hey befr û xwîn." Çi zerafeteke mezin û dilnazikiyeke bêhempa! Dê heyv çawa bibe etegê şevê. An jî welatê me yê ku hey befr û xwîn e dê heta kengê me jî bike befr û xwîn? Îro li ser ekranan dişa befr û xwîn hebû lewre li Bedlîsê operasyonên faşîzmê yên ku qet nasêkinin rastî gerilayan hatine, di nava 2-3 metre berfê de bi teknîka xwe... Helbet hevalan xwe parastîye lê di dawiyê de jî şehîd ketine. Welat dişa bûye berfexwîn, xwînberf. Belkî jî em xwîna berfê ne yan jî berfa îsal xwîna me ye loma ew qas dibare. Jixwe herçî Xerzan e; timî war û meskenê berfê ye, sed sal berê dema li wir bûm çawa dibariya! Çawa hê jî dibare, bi ser hestîyan ve, qet nasêkine. Îcar difikirim; ew şehîdên Xerzanê niha îşev çi dikin, li bin vê berfa bêdawî û sedsale ya ku di rîsteyên hozan Teyîb de gul vedide, dibe welat?

Divê em helbesta Feqîyê Teyran di kesayeta xwe de wiha binivîsinin gelo? Wî gotiye "Ey av û av/ey av û av/daîm diçim dengê te tê." Em jî ji xwe re bibêjin; "Ey av û av/her tim zelal be biherike/genî nebe/nebe kurbe" û hwd... Dengê bayê wekî ye kemana kemangereke dîn jî dîr û jî nêz ve tê. Carinan wekî xebroşkeke tîrsnak talerzê çêdike, carinan jî wekî strana pîresêrek winda gazi mirov dike ber bi navnîşanên veşartî ve.

Em nebûn kurbe, em ê nebin jî. Berxwedana ku di her malî de gul vedike, di her dilî de gazi biharê dike û ber bi Reqayê ve wekî birûskêkê dimeşe, nîşaneyê me ye. Em şervanên avê ne jî evparêzên vê sehra ya jî sextekarî û zordestiyê ne. De bila hozan dişa bibêje "Bihêle heyv etegê şevê bîr."



Nêrîna Bêsînor

Mizgîn Ronak



‘Nehîştin em cîhanê bibînin’



Têkoşîna li diji şîdeta li ser jinan didome. Gulgeş Deryaspî ji têkoşîna xwe bi nivîsandinê mezin dike. Jiyana jinan di pirtûka xweya bi navê ‘Xezal’ de vedibêje û dixwaze wêjeya xwe ji berfireh bike. Deryaspî li gundê Xamîçuru yê Bedlîsê tê dinê û di 18 saliya xwe de tê zewicandin. Deryaspî ji jiyana xwe derdikeve rê û diyar dike ku dê vegotina çirokên jinan berdewam bike. Deryaspî li Zanîngeha Mûşê di Beşa Wêje û Zimanê Kurdî de dixwîne û anî ziman ku xwestiye civaknasiyê bixwîne lê malbatê ew zû zewicandiye û nehiştiye ew bixwîne û wiha got: “Piştî zewicim nehiştin ez derkevim ber derî. Bifikirin; cihan ew qas mezin e lê mirov lê nastirin. Derketina derve qedexe ye. Mirov carekê tê dinê lê cihan li mirovan tê qedexekirin. Sedema vê ji jinbûn bû.”

Deryaspî anî ziman ku azadî di sîniya zêrîn de nayê pêşkêşkirin û wiha axivî: “Îro yek ji pirsgrêka jinan ev e. Jin divê hêza xwe bizane û ji bo xwe bijî. Divê ne ji bo bav û zarokên xwe, ji bo xwe bijî. Li Kurdistanê jinbûn zehmet e. Ya girîng ew e ku mirov li cîhanê wek jin bijî. Ez bûm dayik, heval, dost û rêheval. Gelek nasnameyên min çêbûn. Lê min nasnameya jîntiyê nedidit. Ez dizanim em li vê cîhanê ne azad in. Azadiya jinan di wê de veşartîye.” Deryaspî diyar kir ku divê jin pirsgrêkên xwe çareser bikin û xwe vebêjin da ku bîr fêmkirin. **BEDLÎS - ŞÛJIN**

Endamên cemaetê xistine blokên girtiyên siyasî

Li girtîgehan binpêkirinên mafan derdikevin asta jor. Derket holê ku li girtîgeha Wanê endamên cemaetê xistine nav blokên girtiyên siyasî û bi vê yekê dixwazin provakasyonan pêk bînin

OMER ÎKE / WAN - ANF

Piştî hewldana darbeyê ya 15’ê tîrmehê, bi îlankirina OHAL’ê re binçavkirin û girtin zêde bûn. Li girtîgehên gelek bajarên Tîrkiyeyê, zêdeyî kapasîteyên xwe girtî tîr girtin û li gel vê girtîgehên nû tîr avakirin. Girtîgehên dê wek kampus bîr çêkîrin, kapasîteya wan di navbera hezar û 500 û 5 hezarî de diguhere. Mehekê beriya niha li Wanê jî sê girtîgehên nû hatin çêkîrin û tevî ku hê girtîgehêkî temam nebûne jî girtiyên siyasî lê hatin bicihkirin.

Girtiyên siyasî yên bi navê Serbest Akbaş, Fersat Mendali, Yûsûf Gultekîn û Adem Er ên li Girtîgeha Girtî ya Wanê dimînin bi nameyekê diyar kirin ku ji mehekê zêdetîre li vê girtîgehê hatine bi cih kirin û wiha got: “Em bi gelek hevalên me ji girtîgehên cuda sewqî vir hatin kirin. Hemû mafên me yê qanûnî tîne binpêkirin. Em li blokên cuda hatin bi cih kirin û di nava blokên me de jî endamên Cemaeta Gulen hatine bi cih kirin.”

BÛYERÊN PROVOKATÎF

Li ser navê girtiyên siyasî Serbest Aktaş nameyek ji Serokê ÎHD’ê Şaxê Wanê Mûrat Melet re şand û di nameyê de bal kişand ser rewşa girtîgehê û ev tişt anî ziman: “Hîna avahiya girtîgehê temam nebû, em sewqî



Sirgûn bi îşkenceyê dest pê dikin, bi îşkenceyê diqedin

vê girtîgehê hatine kirin. Li vê girtîgehê hemû mafên me yê hiqûqî tîne binpêkirin. Gardiyan di saetên sevdê de tîr qewîşan û yek bi yek me dihejîmêrin. Girtîgeh jî ber ku nû hatiye çêkîrin û temam nebûye gelek sar e. Hevdiîtinên me yê bi malbatê re kirine mehê carekê ye. Saetên destan nadin me. Dîsa rojnameya kurdî û rojnameyên din û kovaran nadin. Nêzikatiyên personelên provokatîf in. Dema em ji bo mafên xwe yê qanûnî serî li Rêveberiya Girtîgehê didin û daxwazname dişînin hemû serlêdanên me bê bersiv tîr hiştin.”

ENDAMÊN CEMAETÊ

Aktaş da zanîn ku di girtîgehê de di nava blokên girtiyên siyasî de, endamên Cemaeta Gulen bi

cih kirine û ev tişt got: “Dewlet li pey rageşî û bûyerên provokatîf e. Bicihkirina endamên Cemaeta Gulen re dê bûyerên nexweş bi xwe re bîne. Beriya niha tu tiştêk wiha nedihat kirin. Endamên Cemaetê di blokan de gotinên nexweş ên li diji rûmeta mirovan dibijên. Li ser vê bi dehan caran me serî li Rêveberiya Girtîgehê dan, lê belê tiştêk nehat kirin. Dewlet bi zanebûn endamên Cemaetê di nava blokên me û hevalên me de bi cih dike. Rêveberiya Girtîgehê dikare pêşî li van hemû bûyeran bigire. Lê belê tiştêkî nakin. Ji bo vê yekê em dixwazin bi rêya vê nameyê hemû Komeleyên Mafên Mirovan û kesên biwijdan bikevin dewrê.”

LI NAVÇEYA DÊRIK a Mêrdînê, Şukran Ozer a di 25’ê kanûna 2015’an de hat girtin 2 hefte berê tevî 15 girtî û hikum-mxwaran li Girtîgeha Mêrdînê, pêşî hatin derbkirin, paşê rastî lêgerîna tazî hatin û sirgûnî Girtîgeha Curnê Reş hatin kirin. Şukran Ozer li dayika xwe Emîne Ozer geriya û diyar kir ku rastî îşkenceyan tîr û wiha got: “Me dîsa sirgûnî dikin, lê dê sirgûnî ku derê bikin em nizanin.”

Dayik Ozer anî ziman ku keça wê Şukran Ozer 13 meh e girtîye û hîn jî nehatiye dadgehkirin û wiha got: “Em vê qebûl nakin. Îşkenceyê li zarokên me dikin.” Her wiha Ozer anî ziman ku xwarinên li girtîgehê nebaş in û ji ber vê keça wê nexweş ketiye. Alîgirê Serokatîya Giştî ya Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) Necla Şengul, bal kişand ser polîtîkayên sirgûnê yê di salên dawî de li girtîgehan zêde bûne û ev tişt anî ziman: “Dewlet ji sala 2014’an de bi awayekî sistematîk sirgûnan pêktîne, lê belê ji hezîrana 2016’an û vir ve jî ev pîr zêde bû ye. Sirgûn bi îşkenceyê dest pê dikin, bi îşkenceyê diqedin. Lêgerîna tazî û îşkence bi awayekî sistematîk tîr kirin. Bi hinceta SEGBÎS’ê mafê parastinê jî dest mirovan hate girtin. Dewlet tu divitiyên peymanên navnetewî yê îmzekarê wan e bi cih nayîne.”

MÊRDÎN - DÎHABER

Cenazeyê Ozevlî hat definkirin



Endamê Meclîsa Şaredariya Serayê yê DBP’ê Burhan Ozevlî, dema ji bo karekî ji Wanê çû Gurgumê û venegeriya, di wesayîta xwe de mirî hat dîtin. Ozevlî di 13’ê çileyê de bi wesayîta xwe ya taybet ji bo karekî xwe çûbû Gurgumê, di 19’ê çileyê de ji malbata xwe re diyar kiribû ku ew ji Gurgumê ber bi Wanê ve derketiye rê. Piştî cenazeyê Burhan Ozevlî hat dîtin û otopsiya wî hat kirin, malbatê cenaze wergirt û bir li Gundê Baltepe yê Seraya Wanê defin kir. Cenazeyê Ozevlî, bi konvoyek ku ji sedan maşîneyan pêk dihat, birin gund û li gund defin kirin. Endamên Meclîsa Şaredariya Serayê, endam û rêveberên DBP’ê jî di nav de bi sedan kes beşdarî merasîma cenaze bûn. Di rapora otopsiyê de hat diyarkirin ku Ozevlî ji ber karbondioksîtê jiyana xwe ji dest daye. **WAN - DÎHABER**

Mirina karkeran bi dawî nabe

Li Dêrsimê jî ber xetên voltaja zêde 6 kesan jiyana xwe ji dest da. 6 kesên ku di nav de karkerên Şirketa Anonîm a Belavkariya Ceryanê ya Firatê (FEDAŞ) û leşker jî hene, jiyana xwe ji dest da, herî dawî du roj berê li navçeya Pulemûriyê xebatkarê FEDAŞ’ê karkerê bi navê Ozgur Bektaş ê

37 salî jiyana xwe ji dest dabû.

EDENE: Li Edeneyê jî Îbrahîm Şahîn ê 28 salî, li fâbrikaqeyê li Herêma Pişesaziye ya Haci Sabancı dixebitî. Di dema kar de bedena Şahîn li ber makîneya ku plastîkên kêrnehatî dihelîne, ket. Şahîn bi ambûlansê rakirin Nexweşxaneyê Perwerde û Lêkolînê ya

Nûmûneyê, lê belê jiyana xwe ji dest da.

ANTALYA: Li Sîteya Pişesaziye ya Elmalî ya li navçeya Elmalî ya Antalyayê, Muhammet Akkaya ê li ocaxêke keviran dixebitî, ji bo ku kevirê di nava paleta şikandina kevir de asê ma derxe ket nava hewldanê, lê belê kincê wî bi paletê aliqîn.

Akkaya hewl da kincên xwe ji ber paletê derxe, lê vê carê milê wî di nav de asê ma. Hevalên Akkaya ew ji hundirê makîneyê derxistin û bi ambûlansê rakirin Nexweşxaneyê Zanîngeha Akdenîzê. Akkaya 2 rojan li ber xwe da, lê piştî berxwedaneke diyar jiyana xwe ji dest da.

ANF - DÎHABER

Mamosteyek hate revandin

Li navçeya Xurmatû ya Selaheddînê piştî ku ji aliyê kesên nenas ve ciwanek hat kuştin, herman rojê dîsa mamostayek hat revandin. Têkildarî revandina mamoste, berpirsê ragihandina yê Oymeqamiya Xurmatû Mihemed Faîq agahî da û wiha got: “Li nêzî Mizgefta Sebur a li taxa Tînî ya Xurmatû hejmareke çekdarên nenas mamosteyek ber bi cihekî nediyar ve revand.” Hate zanîn ku navê mamosteyê hatiye revandin Ebdulxaleq Hisên e. **GERMIYAN**



Ji ber aşûtê 3 kes mirin

Li Rojhilatê Kurdistanê û çiyayên li ser sînorê Başûr û Rojhilat jî ber barîna berfa zêde, metirsiya aşûtê zêde bûye. Li gorî nûçeya ajansên Rojhilat li bajarê Serdeşt ê Rojhilat 12 kasibkar ketin bin aşûtê û 3 kasibkaran jiyana xwe ji dest da. Navên kasibkaran wiha ne; Diyar Mihemed Nijad (18), Şêrzad Ebdullahî (27) û Hiwa Îbrahîmîniya (22). Kasibkarê bi navê Rizgar Elîzade yê jî gundê Bêwaraniya Jêrê, di bûyerê de lingê wî şikestiye. **SERDEŞT**





Li Yemenê şer diwartir dibe

30 Çile 2017 Duşem

LI YEMENÊ şerê di navbera yekîneyên hikumetê û hûsiyan de diwartir dibe. Li bajarê Mûha yê Yemenê di navbera yekîneyên hikumeta Mansûr Hadî yê ku Erebiştana Siûdî piştigirîya wan dike û milîsên şîi hûsiyan de şerekî diwar diqewime. Hat ragihandin ku yekîneyên hikumetê bi alîkariya Erebiştanê ji bo kontrolkirinê, êrîş birine ser bajarê Mûhayê yê di bin kontrola hûsiyan de. Li gorî agahiyan ku çavkaniyên ji nexweşxaneyan didin çapemeniya Yemenê, di şer de 19 milîtanên hûsiyan jiyana xwe ji dest daye û 20 milîtan jî bi giranî birîndar bûne. Ji yekîneyên hikumetê jî herî kêm 8 leşker hatine kuştin. Her wiha di operasyona li peravên Deryaya Sor de ku di 7'ê çileyê li dijî bajarê di destê hûsiyan de hat destpêkirin, heta niha ji her du alîyan zêdetirî 260 kesan jiyana jiyana xwe ji dest daye. Di heman operasyonê de bajarê Dûbabê yê di destê hûsiyan de ketibû destê yekîneyên hikumetê. **SENA**



Dadgehê qedexeya Trump rawestand

Kanada penaberan dihawîne

PIŞTÎ biryarnameya ku ketina welatîyên Îran, Iraq, Sûriye, Sudan, Lîbya, Somali û Yemenê ketina wan a Amerîkayê qedexe dike, ji aliyê serokê Amerîkayê Donald Trump ve hat înzekirin, gelek welatan bertek nîşanî Trump dan û destnîşan kir ku helwesteke wiha ji aliyê wan ve nayê qebûlîkirin. Kanada jî bertek nîşanî biryara Trump da û biryar da ku penaberan vehewîne. Serokwezîrê Kanadayê Justin Trudeau li hemberî biryara Trump a li dijî hatina penaberan da xuyakirin ku ew amade ne mexdûrên şer li welatê xwe vehewînin. Trudeau destnîşan kir ku hemû penaberên ji ber şer, hevrikiya siyasî û êrîşên terorîst reviyane û got ku amade ye bêyî cihêkariyê bixwe navbera baweriyên, penaberan hilde welatê xwe.

Welatî ji balafirgehan vegeandin

Ji BER betalkirina vîzeyê welatîyên misilman ên ketina welatîyên Îran, Iraq, Sûriye, Sudan, Lîbya, Somali û Yemenê ya Amerîkayê li balafirgehan hat astengkirin. Bi ketina meriyetê ya biryarnameyê re li gelek balafirgehên Amerîkayê welatîyên welatên ku vîzeyên wan hatin betalkirin, hatin zivirandin. Li aliyê din li balafirgehên welatên ku vîzeyên wan hatin betalkirin siwarbûna welatîyên wan ên ku dixwest biçin Amerîkayê hatin astengkirin û destûr nehat dayîn ku li balafiran siwar bibin.

Dadgeha Federal a New Yorkê biryarnameya serokê Amerîkayê Trump a ku pêşî li hatina welatîyên welatên misilman digire, rawestand. Trump û Putîn biryar da ku li dijî terorê têkoşîneke koordînekirî bê dayîn

Dadgeha Federal a New Yorkê bicihanîna biryarnameya serokê Amerîkayê Donald Trump a betalkirina vîzeyê welatîyên Îran, Iraq, Sûriye, Sudan, Lîbya, Somali û Yemenê, ji bo demekê rawestand. Piştî ku biryarnameya betalkirina vîzeyê welatîyên misilman ji aliyê Trump ve hat mohrkirin û ket meriyetê, li balafirgehên Amerîkayê bi sedan kes hatin binçavkirin û der-sinorkirin.

Li ser vî yekê Parêzerên Yekitiya Azadiya Sivîlan a Amerîkayê (The American Civil Liberties Union-ACLU) ji bo berdana kesên hatin binçavkirin û betalkirina biryara Trump a ku pêşî li hatina welatîyên hin welatên misilman digire, serî li Dadgeha Federal a New Yorkê da. Dadgehê piştî serlêdanê bicihanîna biryarnameya Serokê Amerîkayê Donald Trump a ku pêşî li hatina welatîyên hin welatên misilman digire ji bo demekê rawestand.

Trump piştî înzekirina biryarnameya betalkirina vîzeyên welatîyên welatên misilman, di serî de bi serokdewletê Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn, serokwezîra Almaniyayê Angela Merkel û serokdewletê Fransayê François Hollande re bi rêya telefonê hevdtin pêk anîn.

Hat ragihandin ku Trump û serokdewletê Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn di hevdtina xwe de li ser mijara têkoşîna li dijî çeteyên DAİŞ'ê li hev kiriyê û wan bir-



yar daye ku li dijî DAİŞ'ê têkoşîneke koordînekirî bidin meşandin. Her wiha hat ragi-

handin ku Trump di hevdtinên xwe yê bi Merkel û Hollande re jî peyama hevkarîyê daye û ji

wan xwestiye ku têkiliyên di navbera welatên wan de bîn xurtînin. **WASHINGTON**

Îranê jî têketina welatîyên Amerîkayê qedexe kir



WEZARETA Karên Derve ya Komara Îslamî ya Îranê der barê biryara serokê Amerîkayê Donald Trump a betalkirina vîzeyên welatîyên Îran, Iraq, Sûriye, Sudan, Lîbya, Somali û Yemenê daxuyaniyek nivîskî weşand û bersivê tûnd da Amerîkayê. Di daxuyaniyê de hat gotin ku betalkirina vîzeyê welatîyên misilman biçûkxistin e û heta ku biryara betalkirina vîzeyan neyê rakirin dê têketina welatîyên Amerîkayê ya Îranê bê qedexekirin. Her wiha di daxuyaniyê de hat destnîşankirin ku biryara Amerîkayê dûrî aqilan e û li dijî hiqûqa navneteweyî ya dewletan e.

Tûra duyemîn pêk hat

Tûra duyemîn a pêşhîlbijartinê diyar kirina namzetê partiyên çepgir ên serokomariya



Fransayê pêk hat. Di pêşhîlbijartinê de serokwezîrê berê yê Fransayê Manuel Valls û wezîrê berê yê perwerdeyê Benoît Hamon ên ku di tûra yekemîn a pêşhîlbijartinê de bi ser ketibûn, li hemberî hev ketin pêşbirkê.

Di encama pêşhîlbijartinê de dê namzetê partiyên çepgir ê hîlbijartina serokomariya Fransayê ya ku tê payîn di meha nîsanê de pêk were,

diyar bibe. Di tûra destpêkê ya pêşhîlbijartinê de Hamon ji sedî 36,03 û Valls jî ji sedî 31,48'ê dangan girtibûn. Arnaud Montebourg ji sedî 17,52'ê dangan girtibû û aşkera kiribû ku di tûra duyemîn de dê alîkariya Hamon bike. Li herêmên Guadeloupe, Guyane, Martinique û Saint Pierre Et Miquelonê yê li aliyê din ê deryayê, dengdayîn beriya du rojan hat kirin. **PARÎS**

Êrîşên li dijî kurdan nedîtin

Serokwezîra Brîtanayê Theresa May a piştî serdana xwe ya Amerîkayê hat serdana Tirkîyeyê û bi serokomarê tirk Recep Tayyîp Erdogan û serokwezîr Bînalî Yıldırım re hevdtinêk pêk anî, îmze avêt binê projeyê çêkirina balafira şer a tirk. Hat ragihandin ku projeya çêkirina balafira şer a tirk, bi şirketa parastinê û hewayî ya Brîtanayê BAE Systemsê re bi 125 hezar dolarên Amerîkayê (100 milyon sterlîn) hatiye înzekirin. Li gorî lihevkerinê dê şirketa BAE Systems û şirketa tirk a karên hewayî TUSAŞ li ser çêkirina balafira şer a tirk kar bikin.

Serokwezîr May piştî înzekirina projeyê, êrîş û tundiyên li dijî hêzên muxalîf û kurdan paştguh kirin û li gel rewşa awarte ya li Tirkîyeyê, ji bo berjewendiyên xwe yê bazirganiyê pesnê dijdemokratîkbûna Tirkîyeyê da. **AMED**



Komên cîhadîst xwe kir yek

Li Sûriyeyê komên cîhadîst Eniya Fetha Şamê, Ceyşul Sunne, Ensarûddin, Lîva El Hak û Nuredîn El Zengî yê ku bi alîkariya Tirkîyeyê û dewletên kendavê li dijî rejîma Baasê şer dikin û pêşî li tîkçûna wan nayê girtin, di bin navê Heyeta Azadkirina Şamê (Heyet Tahrir Şam) de bûne yek.

Hat ragihandin ku serokê Ehrarûş Şamê yê berê Ebû Cabir Haşim Eş Şeyh wek serokê heyetê hatiye hilbijartin. Komên ku tev li heyetê bûn xwe fesh kir û dê ji niha şûn de di bin navê heyetê xwe bi rêxistin bikin.

Her wiha beriya niha jî komên cîhadîst xwe di bin navê Artêşa Fethê de kiribû yek û li dijî rejîma Baasê tîk çûbûn. **ŞAM**



Fermandarê operasyona rizgarkirina Mûsilê yê hêzên hevbeş ê Iraqê Yehya Resûl der barê operasyonê de civîna çapemeniyê li dar xist û aşkera kir ku der barê waliyê berê yê Mûsilê Esil Nûceyfi de biryara girtinê hatiye dayîn. Resûl di civînê de diyar kir ku piştî aliyê rojhilatê Mûsilê ji çeteyên DAİŞ'ê hatiye rizgarkirin, parastina herêmê radeştî hêzên hevbeş ên Iraq û polisên fed-

eral hatiye kirin. Resûl di berdewamê de da zanîn ku Hêzên Heşdî El Şeebî yê li Nînovayê, li şûna taxên rojhilatê Mûsilê, li gundên derdor û ji herêmên şer dûr bîn bicihkirin. Yehya bi lêv kir ku der barê waliyê Mûsilê Esil Nûceyfi de biryara girtinê hatiye dayîn û li ku derê bê dtin bê desteserkerin û radeştî aliyên berpirsyar bê kirin. **MÛSIL**



Bîranîna Şehîd Sosin

- Şervana YPJ'ê Derman Ozdemîr (Sosin) di 28'ê kanûna 2013'an de li herêma Til Hemîs a Qamişloyê di encama şer de jiyana xwe ji dest dabû. Bi armanca bîranîna Ozdemîr li Genk a Belçikayê bi tevlibûna bi sedan kurdistanîyan merasîmek hat lidarxistin. Di axaftinên merasîmê de şehîd Sosin hat bibîranîn. Şervana YPJ'ê Derman Ozdemîr ji malbateke dîrsimî bû di 2010'an de ji Belçikayê derbasî Kurdistanê bû. Ozdemîr di sala 2013'an de ji di nava têkoşîna azadiyê de jiyana xwe ji dest da. **GENK**



Desteya parastinê Şehîd Nesan bi bîr anî

- Desteya Parastinê ya Kantona Efrînê bi daxuyaniyekê şervanê Erka Xweparastinê Mihemed Nesan ku di 19'ê kanûna 2016'an de şehîd bibû, bibîr anî. Di daxuyaniyê de hat gotin ku hêzên wan bi hêz û xwîna xwe îşbad kiriye ku tu caran nayê şikan-din û wiha bi dawî bû: “Şehîd Mihemed Nesan wekî hezaran ciwanên me, erka xwe ya neteweyî bête-redud pêk anî û canê xwe feda kir. Em bejina xwe li hember şehîdan di tewînin û soza şopandina xeta şehîdan didin.” **EFRÎN**



‘Demhat şopdarê rêya birayê xwe bû’

- Bi sedan şênîyên Serêkaniyê serdana konê sersaxiyê yê şervanê YPG'ê Cûma Mihemed (Demhat Kobanê) kirin. Cûma Mihemed di 25'ê çileyê de di hemleya Xezeba Firatê de li gundê Xînezê Reqqayê şehîd bibû. Di serdanê de mêvanan sersaxî ji malbatê xwestin û dan zanîn ku şehîd Demhat Kobanê xwedî li rêya birayê xwe Demhat derketibû û bi li xwe kirina navê wî ji bibû milîtanê rêya wî. Merasîma sersaxiyê bi dirûşmeyên ‘Şehîd namirin’ bi dawî bû. **SERÊKANİYÊ**



Pirs ji bi qasî bersivê balkêş bû

- Bi armanca nîrxandin û şîrovekirina xalên heypeymana civakî, Meclisa Damezirîner a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê bi welatîyên Sîrrînê re civînek li dar xist. Di civînê de xalên hevpeymana civakî hatin xwendin û beşdaran nêrînen xwe anîn ziman. Li ser pîrsa welatîyekî ya ‘Civakeke azad dikare çawa were avakirin?’ ji endamê meclîsa damîzîner Osman Hisên ev bersiv da: “Civaka azad bi rêya avakirina komunan û tevlibûna hemû pêk-hateyan di neteweya demokratîk, tê ava kirin.” **KOBANÊ**

Li Minbicê goreke komî hat dîtin

Di xebatên paqijkirina mayînan a li derdora nexweşxaneyê Firatê ya Minbicê de pisporên mayînan rastî goreke komî hatin. Hat zanîn ku di vê gora komî de herî kêm 100 cenazeyên çeteyên DAIS'ê hene.

Şervanên Meclisa Leşkerî ya Minbicê li ser daxwaza gelê herêmê di 1'ê hezîrana 2016'an de operasyona rizgarkirina Minbicê dabû destpêkirin. Di çarçoveya operasyonê de bi sedan çeteyên DAIS'ê hatibûn kuştin û bajêr di 12'ê tebaxê de bi tevahî hat rizgarkirin. Çeteyên DAIS'ê yên ku nedixwest windahiye

xwe nîşanî gelê bidin, bi sedan kuştîyên xwe di gorên komî de vedîştartin.

Bi rizgarkirina Minbicê re xebatên jinû-veavakirinê û paqijkirina bajêr ji made-yên teqemeniyê û mayînan, dest pê kir. Di vê çarçoveyê de ekîbên taybet ên rakirina mayînan li derdora nexweşxaneyê Firatê ya Minbicê gelek mayîn bê bandor kirin. Di dema xebatên lêgerîna mayînan de ekîbên pispor rastî goreke komî ya çeteyên DAIS'ê hatin. Tê diyarkirin ku komên çete di vê gora komî de zêdetirî 100 çeteyên xwe veşartine.

MINBIC - ANHA



Rêveberiya xweser mîsogeriya Rojava ye

3'yemîn salvegera ragihandina Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Kantona Efrînê bi şahiyekê hate pîrozkirin. Di şahiyê de hemû şehîdên şoreşê hatin bibîranîn û rêveberiyên xweser ji wek mîsogeriya parastina Rojava hatin destnîşankirin

Şahiya pîrozbahiya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Kantona Efrînê bi dirûşmeya ‘Rêveberiya xweser mîsogeriya Sûriyeyeke federal û demokratîk e’ hat lidarxistin.

Bi armanca pîrozkirina 3'yemîn salvegera ragihandina Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Kantona Efrînê li salona Zagros a Efrînê bi beşdariya bi sedan şênîyên kantonê, şahiyek hat lidarxistin. Salona şahiyê bi alên YPJ/YPG'ê û pankartên ‘Bi rêveberiya xweser ve ber bi sûriyeyeke demokratîk ve’ û

‘Rêveberiya xweser mîsogeriya avakirina Sûriyeyeke federal û demokratîk e’ hatibû xemilandin.

LI GEL PÎROZ KIR

Di şahiyê de tevî bi sedan welatîyan, endam û nûnerên rêveberiya xweser, partyên siyasî, federaliya demokratîk, YPG, YPJ û Asayîşê ji amade bûn. Şahî bi deqeyek rêzgirtinê dest pê kir û sirûda neteweyî ya ‘Ey Reqîb’ hat xwendin. Di şahiyê de Cigirê Serokê Malbatên Şehîdan Xelîl Ehmed ragihandina rêveberiya xweser li hemû şehîd û şervanan pîroz kir û

da zanîn ku rêveberiya xweser ji bo parastina Rojava projeya herî guncav e.

NAME XWENDIN

Serokê Desteya Parastinê ya Kantona Efrînê Ebdo Îbrahîm ji rola şervanan vegot û diyar kir ku rêveberiya xweser pêngava ber bi federaliya demokratîk ve ye. Piştê ji gelek nûnerên din axivîn û salveger li hemû gelên rojavayê Kurdistanê pîroz kirin. Di şahiyê de nameyên gelek derdorên ku nekarin tev li şahiyê bibin ji hat xwendin. Şahî bi pêşkêşkirina stran û govendê bi dawî bû. **EFRÎN - ANHA**



Yekemîn konferansa jinên ciwan pêk hat

Bi dirûşma ‘Bi pêşengiya jinên ciwan parçe bike koletiyê, ava bike azadiyê, azad bike Rêbertiyê’ 1'emîn Konferansa Yekitiya Jinên Ciwan (YCJ) pêk hat.

Yekemîn konferansa YCJ'ê bi dirûşmeya ‘Bi pêşengiya jinên ciwan parçe bike koletiyê, ava bike azadiyê, azad bike Rêbertiyê’ û bi tevlibûna 400 deleqeyên ji Kantona Cizîrê li Salona Zanîngeha Rojava hat li dar xistin. Di konferansê de tevî Hevseroka Kantona Cizîrê Heyfa

Erebo nûnerên rêveberiya xweser, gelek endamên saziyên civakê ji amade bûn. Di axaftinên konferansê de şervanên YPJ'ê yên di eniyên şer de hatin silavkirin û bang li hemû jinên ciwan hat kirin ku xwedî li ruhê şoreşê derkevin û qada parastinê xurt bikin.

Piştî axaftinan ev biryar hatin girtin;

- ✓ Li Kantona Cizîrê avakirina gundekî ekolojîk.
- ✓ Xurtkirina xebatên komunan.

✓ Li herberî êrişên li ser jinan tên kirin hemleyek xurt were birêxistinkirin.

✓ Cîwanên ereb werin rêxistinkirin.

✓ Navend û saziyên jinên ciwan werin vekirin.

✓ Pirtûkxaneyên jinên ciwan were vekirin.

✓ Komîteyên xweser ên parastina cewherî werin avakirin.

✓ Li ser rastiya serokatîyê semîner werin dayîn. **QAMIŞLO - ANHA**



‘Federalî mîsogeriya yekitiya gelê Sûriyê ye

ALAN ROJ / ŞIPAN SILO / TIRBESPIYÊ - ANHA

Endamê Meclîsa Tirbespiyê Hisên Sade diyar kir ku federaliya demokratîk, yekitiya gel û Sûriyeyê mîsoger dike. Nûnerê pêkhatêya ereb ê di Meclîsa Gel a Herêma Tirbespiyê Hisên Sade anî ziman ku rewşa Sûriyeyê roj bi roj aloztir dibe û wiha domand: “Têkildarî çarenûsê de ji rola hêzên demokratîk tê paşguhkirin. Gelê herêmê bi federaliya demokratîk bi bawerîn. Ji ber ku yekitiya gel û axa Sûriyeyê mîsoger dike. Hewldanên çareseriyê yên hêzên nijadperest û yek-perest çareserî ne pêkane.” Sade diyar kir ku bi federaliya demokratîk têkiliyên herêmê bi navendê re xurtir dibin û wiha pê de çû: “Rewşa civakê baştir dibe, ji êşan dûr dikevin û ber bi azadiyê ve diçe. Pergala me di hundirê xwe de exlaq, biratî, hezkirin, azadî û hevgirtina civakî di hewîne.”

Sade got ku destê dewletên herêmî di kûrkirina aloziyê heye û wiha got: “Tirkîye dixwaze federaliyê weke parçebûnê bide naskirin û hêzên demokratîk weke ‘terorîst’ bide qebûl kirin. Lê em Tirkîyeyê baş nas dikin û dibêjin ku me yekitiya xwe bi xwîna xwe ava kiriye. Bila vê peyama baş fêm bike.” Der barê civîna Astanayê de ji Sade daxuyand ku di serî de civîn mehkûmê têkçûyîna bû û sedema vê ji venexwendina nûnerên rasteqîn nîşan da. Herî dawî ji Hisên Sadî wiha axivî: “Herêmên nû tên rizgarkirin û li ser bingeha sîstema demokratîk û exlaqî tên birêvebirin. Em hemû detkeftî û pêşketinên xwe dispêrin perspektîvên Rêber Apo. Ez bang li gelên me dikim ku bi rêya rêveberiya xweser civaka xwe ya demokratîk ava bikin.”

Li Babê çawişekî pispor hat kuştin

- Şerê di navbera hêzên artêşa tirk a dagirker û komên çete yên DAIS'ê de ye li herêma Babê didome. Li gorî agahiyên ji herêmê hatine bidestxistin, di encama şer û pevçûnên dawî yên di navbera herdu koman de çawişekî pispor hat kuştin û 2 leşker ji birîndar bûn. Hat zanîn ku artêşa tirk cenaze û birîndarên xwe rakirin nexweşxaneyê Dîlok û Kîlîsê. Hat zanîn ku de cesedê leşkerêkî bişînin Îzmîrê. **BAB**



Heta azadiyê dê çalakî bidomin

Li ber Hauptbahnhofê, bi şiyara ‘Ji Ocalan re azadî, ji Kurdistanê re statu’, 500 Kurdistanîyên ji bajarên Frankfurt, Hanau, Offenbach, Giessen û Darmstadtê hatin heta qada Romerê meşyan. Li ser navê NAV-DEM’ê Vildan Dîrik daxuyanîyek da û got ku “Heta azadiya Serok Apo, em ê çalakiyên xwe bidomînin.”

FRANKFURT



Li Essenê şermezarkirina tecrîdê

Di pêşengiya Meclisa Jinê ya Şengalê ya Bêrivan û Navenda Civaka Demokratîk a Kurd, meşek hat lidarxistin. Kurdistanîyên ji bajarên Essen û Duisburgê hatin û tecrîda li ser Ocalan şermezar kirin. Parlamenterê HDP’ê yê Şirnexê Faysal Sariyildiz li vir axivî û diyar kir ku Tîrkiye gav bi gav dirûxe û wiha got: “Yê ku dikare pêşî li vê bigire û aştîyê bîne Tîrkiyeyê û Rojhilata Navîn birêz Ocalan e.”



‘Bêyî Rêber Apo jiyan nabe’

Li gelek bajarên Almanyayê Fransayê tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û faşizma AKP’ê bi meş û mîtîngên girseyî hat şermezarkirin.

HAMBURG



Kurd û dostên wan ên ji bajarên Bremen û Kielê hatin, li ber Gara Trenê ya Navendî dest bi meşê kirin. Meleyê Mizgefta Şêx Seid a Bremenê Mele Eşref li vir axivî û da zanîn ku Ocalan dengê gelê mezlûm e. Eşref destnîşan kir ku dîlgirtina Ocalan zilma li dijî kurdan e û berxwedana li dijî zilmê ji rewya ye.

BONN



Girseya gel a li qada Frankenbadê li hev civiyan, bi dirûshmên ‘Bê Serok jiyan nabe’ û ‘Terorîst Erdogan’ heta Munsterplatzê meşiya. Nûnerê Rote Hilfeyê destnîşan kir ku azadiya Ocalan dê çareseriyê bo gelan bîne û ji hikumeta alman xwest ku bes piştigiriyê bide dewleta tirk û qedexeya li ser PKK’ê rake.

BERLÎN



Meşa ji aliyê Meclisa Jinan a DEST-DAN ve hat organîzekirin, ji bo azadiya Ocalan belavok hatin belavkirin. Nûnera DEST-DAN’ê Susanna Rossling destnîşan kir ku heta azadiya Ocalan û hemû girtiyên azadiyê pêk neyê, dê têkoşîna xwe bidomînin.

WUPPERTAL



Platforma Çalakiyan a Yekitiya Hêza Demokratîk, li dijî terora dewleta tirk a li bakurê Kurdistanê û Tîrkiyeyê bi şiyara ‘Li dijî faşizmê, em têkoşîna rêxistinbûyî xurtir bikin’ meşek pêk anî û meş veguherî mîtîngê. Girseya gel di mîtîngê de komkujiyên AKP’ê şermezar kirin û banga xurtkirina têkoşîna hevpar hat kirin.

DRESDEN




Li Dresdenê jî di pêşengtiya Meclisa Jinan ya UTA’yê de bi şiyara ‘Azadiya Rêberê me azadiya jinên kurd e’ çalakiyek hat lidarxistin. Kurdistanî û dostên wan ji Pragerstrasse heta Hauptstrasseyê meşyan û tecrîd li ser Ocalan şermezar kirin.

Ji 13 welatan 70 kes bo Ocalan dimeşin

Ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dê ji 13 welatan 70 kes ji Luksemburgê heta Strasbourgê bimeşin. Ev meşa dirêj dê di 1’ê sibatê de dest pê bike û heta 11’ê sibatê bidome

Bi nêzbûna salvegera komploya naventeweyî ya 15’ê Sibatê ku gelê kurd wek ‘Roja Reş’ pênase dike, çalakiyên gel roj bi roj zêde dibin. Dê bi dirûşma ‘Ji Ocalan re azadî, ji Kurdistanê re statu’ di 1’ê sibatê de li ber Dîwana Edaletê ya Ewropayê ya li Luksemburgê bi daxuyanîyeke çapemeniyê meşeke dirêj bê destpêkirin û dê 10 rojan bidome.

Ji 13 welatan, dê 70 kes tev li vê meşê bibin. Hunermend Sarah Mauriaucourt ê ji Fransayê, doktor Daniel Maraz ê ji Arjantinê, diroknas Joaquin Martínez ê ji Îspanyayê, Nûnerê



Platforma Azadî yê Rojava Roc Peris ê ji Katalonyayê, aktivîst Susana Ísabel û Macedo Gomes ê ji Portekizê û Julia Íglesias a ji Komeleya Piştigirîya Kurd-Bask a Newrozê ji Îspanyayê, dê di

meşê de cih bigirin.

Endamê Konseya Rêveber a KNK’ê Adem Uzun der barê armanca meşê de axivî û diyar kir ku di dîroka siyasî ya kurdan de cara yekemî e, tiştêkî bi vî rengî dibe. Ji her devera cihanê dê mirov ji bo Rêber Apo bimeşin.

PARTIYA SOSYALÎST

Uzun aşkera kir ku amadekariyên meşê qediyane û wiha axivî: “Meşvanên ji gelek welatên cihanê hatine, gihîştine Bruksel, Almanyayê û Strasbourgê. Ev meş dê bibe mesajeke navneteweyî. Dê

peyamekî bide Konseya Ewropayê, CPT û welatên Yekitiya Ewropayê (YE).” Uzun piştrast kir ku Partiya Sosyalîst a Fransayê ya li desthilatdaryê, dê piştigiriyê bide meşê. Hat gotin ku Şaredariya Metzê jî dê di 3’ê sibatê de tevî meşvanan, li ser Rojava û armanca meşê konfer- ansekê li darbixe.

Ji bilî Meşa Enternasyalîst dê 300 ciwanên kurd jî di 5’ê sibatê de ji Almanyayê bimeşin Strasbourgê. Her wiha dê li gelek welatên Ewropayê kurd û dostên wan 3 rojan bimeşin û bi hezaran kes jî li Milanoyê meşê pêk bînin. **BRUKSEL – ANF**

Li Toskanayê panela Ocalan

Li paytexta herêma Toskana ya Îtalyayê Floransayê, bi beşdarbûna Endamê KNK’ê Fuat Kav û ji parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Mahmut Şakar panelek hat lidarxistin.

Panel ji aliyê Komîteya Kurd a Toskana û Navenda Xwerêveberiyê ya Gelan (CPA/Centro Popolo Autogestione) ve hat organîzekirin. Endamê KNK’ê Fuat Kav û parêzer Mahmut Şakar wek axêver beşdarî panelê bûn.

Ji Zanîngeha Firenzeyê gelek xwendekar di panelê de amade bûn. Di panelê de têkoşîna Ocalan, Şoreşa Rojava û polîtîkayên faşîzan a AKP’ê yên li Kurdistan û Tîrkiyeyê hatin nirxandin. Endamê KNK’ê Fuat Kav da xuyakirin ku piştî Şoreşa Rojava, dewleta tirk li dijî van destkeftiyên li Kurdistanê hê bêhtir êrîşkar bûye û berê xwe daye polîtîkaya tunebûnê.

Kav bal kişand ser meşa 11’ê sibatê ya li Milanoyê jî û wiha got: “Ev 18 sal in birêz Ocalan li Gireva Îmratîyê di tecrîdê de ye, di serî de li Îtalya, divê em li gelemperîya Ewropayê hesasiyeteke girîng bafîrînin û têkoşîneke mezin bikin.”

Parêzer Mahmut Şakar jî da xuyakirin ku tevî tecrîd û êrîşan ji Ocalan hewldanên xwe yên bo aştîyê li girtîgehê zêdetir kiriye û bi vî rengî veguherîye qasîdê aştîyê. Şakar anî ziman ku hemû gelên bawerîya wan bi azadî û demokrasîyê heye, divê ji bo azadiya Ocalan têbîkoşin û pergala Konfederalîzma Demokratîk a Ocalan pêşniyar kiriye, bide avakirin. **TOSKANA – ANF**



Dê 3 rojan bimeşin

Kurdistanîyên li Ewropayê jî bo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar bikin û vê pêkanîna dewleta tirk lanet bikin, dê ji bo Rêberê xwe Ocalan derkevin qadan. Li Swîsreyê bi şiyara ‘Ji Ocalan re azadî, ji Kurdistanê re statu’ dê meşeke dirêj a 3 rojan bê lidarxistin.

Meşa k udi pêşengiya Navenda Civaka Demokratîk a Kurd a Swîsreyê (DEM-KURD), di navbera 2 û 4’ê sibatê de tê lidarxistin û dê

meş 3 rojan bidome. Meşa ji bo azadiya Ocalan û lanetkirina tecrîdê dê di 2’ê sibatê de li Cenevreyê dest pê bike, di 4’ê sibatê de li paytexta Swîsreyê li Bernê biqede.

Di van 3 rojên meşa dirêj de, dê li ser tecrîdê dosyayekî radestî saziyên navneteweyî û swîsreyî bînin kirin. Li ser navê Komîteya Amadekar a Meşê, Salih Saglam banga tevlibûnê kir. Saglam bal kişand ser şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û aşkera kir

ku azadiya Ocalan sedema man û nebûna kurdan e û ev tişt got: “Ji bo em pêşî li planên dewleta tirk a mêtînger bigirin, ji bo destekê bidin berxwedana gelê kurd û ya herî girîng ji bo azadiya Rêberê xwe, lazim e em tevli meşê bibin. Em berxwedana xwe çiqasî geş bikin, em ê hê bêhtir nêzî azadiyê bibin.”

Meşê di Cenevreyê li ber Jardîn Anglaîsê saet di 11:00’an de dest pê bike. **BERN – ANF**

Greva birçîbûnê provoke dikin

Li Girtîgeha Tîpa F a Edîrneyê bi sedan girtî di nava şert û mercên giran de tên girtin, ji 17’ê çileyê û vir ve 5 rojan carekê bi dorvegerî dikevin greva birçîbûnê. Girtiyên ketine grevê dixwazin; tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bê rakirin, Midûrê Girtîgehê

Haydar Alî Ak ê ku bi pêkanînen xwe yên îşkenceyê tê zanîn, divê ji wezîfeyê bê girtin, hevserokê HDP’ê Selahattîn Demîrtaş û parlamenterê HDP’ê yê Colemêrgê Abdullah Zeydan ê li hucreyên heman girtîgehê tên girtin, li qewîşa girtiyên siyasî bînin bicihkirin û hemû alavên

hatine desteser kirin bînin radest kirin. Lê rêveberîya girtîgehê girtiyên di grevê de provoke dike. Derket holê ku gardîyanê bi navê Cumalî, gefê li girtîyan dixwe. Grev niha ji aliyê koma sêyemîn ve tê birêvebirin. Hat ragihandin ku rêveberîya girtîgehê heqaretê li girtîyan dike.

Vê carê jî Bîlgen hat binçavkirin

Hikumeta AKP/Qesrê jî bo rojevê biguherînin û têkoşîna HDP’ê asteng bikin, her roj 2-3 parlamenerên HDP’ê binçav dike. Herî dawî berdevkê HDP’ê Ayhan Bîlgen li balafirgeha Esenboga ya Enqereyê hat binçavkirin. Bîlgen ê ku sedema binçavkirina wî nehat zanîn, Li gorî agahiyan dê Bîlgen bînin Amedê û dê îfadeya wî li Amedê bê girtin. Berî du rojan jî parlamenterên HDP’ê Huda Kaya, Meral Danış Beştaş û Altan Tan hatibûn binçavkirin û piştî îfadeyê hatibûn berdan. **ENQERE**

‘Ji PDK û YNK’ê be dê hilbijartin çênebin’

Çawa serokwezîrê tirk Erdogan li Tîrkiyeyê qanûn û meclîsê nas nake, der barê her tiştî de biryaran dide, heman rewş li Başûr jî hêla PDK’ê ve tê pêkanîn. Nivîskar û lêkonîrê kurd Prof. Dr. Salar Basîre diyar kir ku şerm e li welatekê behsa hilbijartinê giştî bê kirin û parlamento kar nake û wiha got: “Niha li başûrê Kurdistanê parlamentoyek qanûnî tune, serokê herêma qanûn û hikumet nas nake. Ger bi ya PDK û YNK’ê be dê hilbijartin çênebin.” Basîre got ku bawerîya wan bi gel nemaye û piştrast kir ku pewîstî bi demokrasîyê heye. **SİLEMANÎ**

Ji bo dengê gel 'Hayir TV' ava kirin

Hayir TV a li ser ceribî-nên Çapul TV a di dema Geziyê de hat vekirin, dê dema pêvajoya referandûma



Qanûna Bingehîn de her tiştên têkildarî "na"yê biweşîne. Avakarên Hayir TV'yê dibêjin ku çareserî di 'na'yê de ye.

Çapul TV a di dema çalakiyên Geziyê de li dijî sansurê bû dengê berxwedanê, dê di pêvajoya referandûma qanûna bingehîn de cihê xwe bide Hayir TV'yê. Hayir TV dê li ser tora civakî weşana xwe bike û her tiştê têkildarî 'na' yê de bi weşîne. Têkildarî mijarê de Ali Ergin Demirhan ku yek jê avakarên Hayir TV'yê ye da zanîn ku TV'ya wan ji bo hin pêdiviyên derketiye holê û wiha domand: "Li ser çapemeniya muxalîf çewisandineke mezin heye û me jî xwest em bibênin em ne bédengin. Em jî vê re dibêjin medyaya civakî. Di vê têkoşînê de gelek derdorên cuda mil dan milên hev. Me xwest dengê xew bi mantiqa kolektîvîzmê bi rêxistin bikin."

Di dawiyê de jî Demirhan ev tişt anîn ziman: "Dê di demekê nêzde dest bi weşanê bikin. Yên ku dixwazin dikarin li ser hesabên heyi yê Çapul TV'yê xwe bigihînin me. Ji bo vê pergale gazinca me heye û em bê alternatîf nînin. Em mecbûr in ji vê pergale re bibêjin 'na'. Heke derdê yekî ji rizgarkirina welat ji xetereyê re hebe, ew jî di 'Na' yê de derbas dibe." **STENBOL - DÎHABER**

Hikumet gefan li jiyanê dixwe



Sekreterê Giştî yê Vakfa Mafên Mirovan a Tirkîyeyê (THIV) Metin Bakkalci diyar kir ku rayedarên hikumeta bi gotinên xwe û bi rêya çapemeniyê tundiyê rewşa dikin û da zanîn ku ew ê ji qanûna bingehîn a ku jiyanê wî dixwe xetereyê re bibêje 'na'.

Metin Bakkalci anî ziman ku serweta 10 kesan bi qasî ya nivîya mirovên cihanê ye û wiha dom kir: "Televîzyonên cihanê û Tirkîyeyê bi weşanên xwe hewlîdînin û bê edaletiyê asayî bikin. Dewlet, tundiyê jî bi zanebûnê zêde dike. Mînak: wêneyên tundiya kujerê Reînayê û 15'ê tîrmehê bi rojan di TV'yan de di weşandî. Ev yek jî pêşiyê li tundiyê vedike. Bi vê yekê civak tenê nabe şahidê vê tundiyê, di heman demê de dibe mudaxilê vê tundiyê jî. Ew jî dibe perçeyekî vê tundiyê."

Bakkalci da zanîn ku di pêvajoya aşitiyê de tundî kêmtir bû û wiha pê de çû: "Lê piştî 20'ê tîrmehê careke din zêde bû. Di dema şer de tundî zêde dibe û yê aşitiyê de jî kêmtir dibe. Ji bo pêşketina aramî, mafên mirovan, hiqûq û demokrasîyê pêdivî bi edaletê heye. Ev guhertina qanûna bingehîn ne ji bo aramî û ewlehîya mirovan e. Ev teklîf tundî, zext û gefan e. Ez jî vê qanûna bingehîn ku jiyanê min dixwe bin gefanê re dibêjim 'na'." **ENQERE - DÎHABER**

Êlihî jî pergala yekzîlamî naxwazin

Gelê Êlihê guhertina makeqanûnê ya tifaqa MHP-AKP'ê wek sîsteme 'dîktatorî û zayendperestiyê' bi nav kir û da zanîn ku dê ji bo welatekî demokratîk bibêjin 'na'. Welatiyan diyar kir ku pirsgrîrêkên Tirkîyeyê bi pergala yekzîlamî çareser nabin



Gulistan Akel



Muhlîse Kîna



Sebîha Ekinçî



Fikret Taşkın

Welatiyên Êlihê têkildarî referandûma guhertina qanûna bingehîn helwesta xwe diyar kir û destnîşan kir ku dê ji bo Tirkîyeyê demokratîk di referandûmê de bibêjin 'na'.

Têkildarî mijarê jîna bi navê Muhlîse Kîna (54) diyar kir ku dê di referandûmê de 'na'yê bi kar bîne û sedema vê jî wiha vegot: "Ji ber ku ez naxwazim welat bi destê kesekî tenê bê birêvebirin. Ez bang li her kesî dikim ku ji bo pêşilêgirtina şer û

rijandina xwînê xwedî li vîna xwe derkevin. Bi 'erê' kirinê dê vîna me hemûyan têkeve destê yek kesî. Di vê pergale de zîlm û zordestî heye."

Fikret Taşkın ê 61 salî jî got ku ew dixwaze Tirkîye demokratîk bibe û wiha domand: "Ji bo vê yekê jî ez ê bibêjim 'na'. Bi hatina pergala serokatîyê dê serdema Abdulhamîd nûjen bibe. Dixwazim her tişt bi demokrasîyê bê çareserî kirin." Jîna bi navê Sebîha Ekinçî sedema hel-

westa xwe ya 'na' yê de wiha got: "Bi vê pergale dê jin hin bêhtir bê kolekîrin. Em ê ji pergala yekzîlamî re bibêjin 'na'."

Hevşaredara Êlihê Gulistan Akel a ku jî pey-wirê hate dîrxistin jî destnîşan kir ku bi vê makeqanûnê, pirsgrîrêk çareser nabin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Dê welat ber bi rejîmeke yekperest ve biçê. Em ê li dijî politîkayên înkâr û zayendperest bibêjin 'na'." **ÊLÎH - DÎHABER**

Asûrî û keldaniyan jî ji dîktatoriyê re got 'NA'

Sazî û rêxistinên asûrî-suryanî yên li Swêdê bang li kedkar û gelên bindest kir ku di referandûma rejîma dîktatoriyê ya Tirkîyeyê de dengê 'na' bi kar bînin.

Roj bi roj bertek û hel-

westên li hemberî hewldana guhertina rejîma Tirkîyeyê ya MHP-AKP'ê zêde dibin. Der barê mijarê sazî û rêxistinên asûrî û suryaniyan daxuyaniyeke hevpar weşandin û bang li hemû

kedkar û gelên bindest kirin ku di referandûmê de dengê 'na' yê bi kar bînin. Daxuyanî jî hêla Kongreya Gel a Mezopotamyayê, Partiya Azadiyê ya Mezopotamyayê, Navenda Çandê ya Mezopotamyayê û Komeleya Piştigiriya ya Mezopotamyayê ya Stockholmê ve hate dayîn.

Di daxuyaniyê de êrişên li dijî hevşaredarên DBP'î û parlamenterên HDP'î hat şermezarkirin û ev tişt hatin parvekirin: "Bi van kiryanan dixwazin deskeftiyên gelan tune bikin. Em ji van kesên ku Tirkîyeyê weke malê bavê xwe di bînin, bi dizîyê tînin zanîn, ên ketine pey xewnên xelîfetiye, piştigirîvanên çeteyan, kujerên gelên Kurdistan, Iraq û Sûriyeyê, yê faşîzmê li ser civakê ferz dikin, ên dîktator û kujerên jin, zarok û hemû mirovahiyê re dibêjin 'na'. Em bang li gelê asûrî, suryanî, keldanî û hemû gelên bindest dikin ku di referandûmê de bibêjin 'na'." **STOCKHOLM - ANF**

'Sedemên 'na'yê gelek in'

Gulistan Koçyîgît destnîşan kir ku ji bo helwesta wan a di referandûmê de bi hezaran sedemên wan ên 'na'yê hene û diyar kir ku dê pergala zordestî û yekzîlamîyê red bikin.

Hevberdevka Kongreya Demokratîk a Gelan (HDK) Gulistan Koçyîgît anî ziman ku dê HDK di pêvajoya referandûmê de 'Na' yê birêxistin bike. Koçyîgît da zanîn ku dê li bakurê Kurdistanê jî xebatên wan bi pêşengîya KCD' û bi koordînasîona bi hêzên din re bi meşe.

Gulistan Koçyîgît bi bîr xist ku di salên dawî de li bakurê Kurdistanê bajar hatin rûxandin, gel pir êş kişandin, parlamenter û hevşaredar hatin girtin û wiha dom kir: "Ev yek encama pergala yekperestiyê ye. Pêşniyara îro hatî kirin jî dê wan êşan girantir bike. Divê li dijî vê pergale hemû gel rabin ser pêyan. Em vê pergala zordestî û

yekperestiyê red dikin." Koçyîgît axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Hemû politîkayên AKP'ê li ser dijberîya jinê ne. AKP dixwaze jinê bixîne û bi vê yekê civakê teslîm bigre. Gotina jinê ya 'Na' yê gelek girînge. Ji ber vê yekê divê jin 'Na' yê xurt bikin. Ji bo bi hezaran sedeman em dibêjin 'Na'. Ji bo 'Na' yê bi hezaran sedemên me hene."

AMED - DÎHABER



Qedera Erdogan di destê kurdan de ye

Desthilatdariya Erdogan û AKP'ê bi paketa guhertina makeqanûnê Tirkîye ber bi pêvajoyeke din a krîtîk ve bir.

Xuya ye ku Erdogan û dewleta kûr a li dora wî bûye yek, dixwazin hêvî û bawerîya civaka Tirkîyeyê ya demokratîkbûnê û bendewariya gelê kurd a statuyê qanûnî di qirika wan de bihêlin û vê fîr-senda guhertinê (Çimkî êdî Makeqanûna 12'ê Îlonê bi tu awayî nabe bersiva Tirkîyeyê) 100 salên din jî taloq bikin.

Heke mirov bibêje ku bi vê qanûnê tenê dixwazin ji bo Erdogan qadeke bêsînor a desthilatdariyê ava bikin, ev yek dê ne bes be. Tevî vê armancê her wiha dixwazin bi vê guhertinê pêşî li seqayê guhertin û veguhertinê bigirin. Ango ji niha ve dixwazin zemîna şoreşa demokratîk a li Tirkîyeyê asteng bikin.

Piştî hewldana derbeyê ya 15'ê Tîrmehê AKP'ê bi tifaqa xwe ya bi MHP'ê re xwest zemîneke meşrû ava bike. Hewl da ku CHP'ê jî razî bike. Lê hem jî hundir û hem jî ji derve nerazîbûneke mezin li hemberî wan politîka-

yên wan heye.

CHP li dijî guhertinê ye û aligîra statukoya kevînar e. Devlet Bahçeli piştigirê dîktatoriya Erdogan û AKP'ê ye lê beşeke mezin a MHP'ê li dijî paketê ye. Hin komîkên biçûk ên wekî Hûda-Par û KDP'ê jî ji bo berjewendiyên xwe piştigirîya xwe aşkera kir.

Ji ber vê rewşê pir zelal e ku qedera vê referandûmê di destê gelê kurd û Kurdistanê de ye. Bi gotîneke din di destê hilbijêrên HDP'ê û DBP'ê de ye. Ji daxuyanî û minaqeşeyên der barê mijarê de diyar e ku ew HDP û DBP xwe ji bo eniyêke hevpar a 'NA'yê amade dikin.

Gelo beke kurd bibêjin 'NA' dê çi encamê bi dest bixin?

1- Ji bo kurdan 'NA' yê wateya rawestandina înkâr û qetliaman. Her dengêkî 'ERÊ' ku li Kurdistanê bê dayîn tê wateya 'erêkirina qetliam, kuştin û tunekirinê.

2- Ji ber ku piştigirîya ji bo dîktatoriya Erdogan kêmtir e, hejmara dengên Kurdan dê qedera referandûma hemû Tirkîyeyê diyar bike. Ji bo vê yekê jî bîguman divê kurd biçin ser sîndoqê û bibêjin 'NA'.

3- Heke kurd ji sedî 90 bibêjin 'NA', li hemû Tirkîyeyê referandûmê bê qebûlîkirin jî ev yek tê wê wateyê ku makeqanûna nû ne aîdî kurdan e û wan ew qebûl nekiriye. Lewre jî 'NA'ya kurdan mijareke jiyaniyê ye ji bo teşhîrkirina nemeşrûbûna qanûnên Erdogan.

4- Her wiha kurd dikarin bi kampanyayêke berfîrê û xurt a ji bo hilbijartinan referandûmê perdeya bédengiyê ya bi Rewşa Awarte hatiye raçandin, biçîrînin û ji ser xwe biavêjin. Ev yek dê bibe wesîle ku 8'ê Adarê û Newroz hîn xurttir derbas bibin.

Ji ber van sedeman 'NA'ya kurdan nasibe 'NA'ya CHP'ê û yê din. Heke kurd bikarin bi rêjeya ji sedî 90 bibêjin 'NA' dê şimaqeke gelekî diwar li rûyê siyaseta dîktatoriyê bixin.



Mihyeddin Melko

HDP ji bo xebatên referandûmê dicive

Bi armanca nîrxandina girtin û bişavkirina parlamenteran û diyarkirina rêbaza xebatên referandûmê, koma Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) dê li Amedê civînekê li dar bixe. Hat zanîn ku dê di civîna HDP'ê de endamên Têvgera Jinên Azad (TJA), Kongreya Demokratîk a Gelan (HDK) û Kongreya Civakên Demokratîk (KCD) jî amade bin. Li gorî agahiyên parlamenterê HDP'ê yê Amedê Altan Tan, dê civîna roja şêşemê were lidarxistin. **AMED**



Hûn nikarin pêşiya 'na'yê bigirin

Lîneya Rêveber a HDP'ê diyar kir ku tifaqa Erdogan-AKP-MHP parlamenterên ku xebata referandûmê dimeşînin tacîz dike û dadgeh jî bi vê tifaqê re bi koordîneyî di xebitin. Lîneyê der barê bişavkirina parlamenterên HDP'ê de daxuyaniyek weşand û diyar kir ku bişavkirin 'bêhiqûq' ne û ev tişt gotin: "Diyare ku tifaqa Erdogan-AKP-MHP bi vê pêkanîyê parlamenterên me yê ku xebatên 'na'yê di meşînin tacîz bikin. Dadgeh û ev tifaq ji hev re dixebitin. Tevî ku destnêdayîna parlamenterên me heye jî Berdevkê Hikumetê Numan Kurtulmuş bi gotinên 'pêvajoyek hiqûqî heye' re mijarê berovajî dike û dê tu daxuyanî wî jî sûcê wan rizgar neke. Dê tu kes nekare bi gef û şantajên xebatên me yê ji bo referandûmê ku gelê bibêje 'na' asteng bike." **ENQERE**



Pêşengê nemir ê berxwedana Geverê:

Îslam Ronî

Îslam Ronî di dema berxwedana Geverê de tev li refên YPS'ê bû. Ronî bû pêşengê berxwedana Geverê û bi erka berpirsariya xwe rabû û bû pêşengê nemir ê berxwedana Geverê

YAŞAR AKSU / COLEMÊRG - ANF

Di berxwedana Geverê de ku dewleta tirk hemû derfetên xwe yên şer seferber kirin, lê nekarî bi ser bikeve, yek ji berxwedêrên tev li karwanê nemiran bû Îslam Ronî ye. Bi gotinên dayika wî em qala jiyana pêşengê nemir ê berxwedana Geverê Îslam Ronî dikin.

Îslam Ronî (Talîp Bartîn) li gundê Oremarê yê Geverê, di bihara sala 1987'an de ji dayik dibe. Malbata wî yek ji wan malbatan e ku di sala 1993'yan de ji ber ku gundê wan hat şewitandin, ji neçarî koç kir. Neçar man ji gund koçî naven-da Geverê bikin. Yek ji heft zarokên malbatê ye. Jir, zîrek û bi rehî e. Hemû karên xwe diqedîne û alikariyê dide hemû kesên pêwîstiya xwe bi alikariyê heye.

DIDE DÛ RASTIYÊ

Îslam Ronî, dema li Geverê ye êşên herî giran ên gelê kurd ji nêz ve dibîne. Di wê baweriyê de ye ku divê ev zîlm êdî biqede, jiyaneke azad û demokratîk mafê herî xwezayî yê gelê kurd e. Û dest bi lêgerî-na rastiyê dike.

Îslam Ronî ku bi xeyala Kurdistanê azad diji, pismamê xwe Îslam Bartîn ê di nava Tevgera Azadiyê ya Kurd de tê dikoşe, ji xwe re dike mînak. Piştî ku Îslam Bartîn di sala 2005'an de şehîd dibe, berê Îslam Ronî her tim li çiyayên azad ên Kurdistanê ye. Salek piştî şehadeta pismamê xwe, hê di 19 saliya xwe de tev li nava refên PKK'ê dibe. Bi biryar e ku çeka pismamê xwe li erdê nehêle û navê wî li xwe dike. Îslam Ronî êdî dest bi têkoşîna çekdarî dike.

Îslam bi zîrekî û wêrekiya xwe, di demeke kurt de di nava hevrêyên xwe de balê dikişîne û her tim li refên pêş şer dike. Îslam Ronî di her operasyonê de bi pêşengî li ber xwe dide. Herî dawî di çalakîya Oremarê de ji sê cihan birin-dar dibe. Tevî wê yekê jî têkoşîna xwe nivco nahêle. Piştî tedawiya salekê bi xurtî



Tehemûlî cenaze nekirin

DI ENCAMA lêkolîna wekilan de derket holê ku cenazeyê Îslam Ronî li Erzîromê ye. Cenaze bi rojan li morga Nexweşxaneyê Dewletê ya Erzîromê tê hiştin. Malbat cenaze digire, lê dewleta tirk destûrê nade ku cenaze li navenda Geverê bê veşartin. Her wiha tehemûl nake ku konê sersaxiyê li vir bê vedan. Li ser vê yekê cenazeyê Îslam Ronî li gundê Cîvyan ê Geverê tê veşartin.

Kurê min bi lehengî şehîd bû

DAYIKA ZELÎHA Bartîn destnîşan kir ku ew bi şehadeta kurê xwe serbilind e û wiha got: “Kurê min Îslam Ronî mirovekî dilpak, jîr û zîrek bû. Dilsozê ax û gelê xwe bû. Di kîjan rê de dimeşîya her tim bi fedakarî û lehengî meşîya. Bi lehengî jî şehîd bû. Em bi vê dizanîn; hevrêyên wî dê xwîna wî li erdê nehêlin. Ji ber ku kurê min ji bo ax û gelê xwe şer kir. Em kurd bi kuştinê naqedin. Bila êdî bi vê bizanin. Kurd dê bi têkoşîna van lehen-gan bi ser bikevin. Kurê min şehîd e û dê di dilê gelê kurd de her tim bijî.

û hê bi bawerî cihê xwe di nava çalakîyan de digire.



ERKA BERPIRSARIYÊ

Îslam Ronî neh salan li qadên azad dimîne û di sala 2015'an de piştî ku xwerêveberî tê ragihandin, cihê xwe di nava yekîneyên YPS Geverê de digire. Dibe pêşengê berxwedana Geverê û bi erka berpirsariya giştî radibe.

Piştî ku derketina derve li Geverê hat qedexekirin, dewlet bi tang, top û bi hezaran leşker û polisên xwe êrişî Geverê dike. Bi qasî 200 şervanên YPS'ê yên bi fermandariya Îslam Ronî, bi xurtî û bê tirs li ber xwe didin. Tevî şerê ku bi mehan dewam kir, dewlet nikare gawekê ji bi pêş ve biçe. Bi derbên giran ên li dewleta tirk tîst xistin re, di-roka Geverê ji aliyê Îslam Ronî û hevrêyên wî ve ji nû ve tê nivîsandin.

TIRSA DILÊ DIJMIN

Dewlet bi hemû derfetên xwe êriş dike, lê nikare berxwedana Geverê bişikîne. Vê carê jî êrişî gelê sivil dike. Li ser vê yekê, stratejiyeke duyemîn dikeve dewrê û gelê sivil ji qadên berxwedanê tê derxistin. Şer bi mehan dewam dike û şervan bi soza ku heta şervanek bimîne dê tîst bikoşin, bi wêreki şer dikin. Îslam Ronî, tevî ku derfetên derketina ji qada şer hebû jî hevrêyên xwe tu carî bi tenê nehiştin û di dema vî şerî de tevî sê hevrêyên xwe di 19'ê Nisanê de şehîd bû. Li gorî gotinan piştî şehadeta Îslam Ronî ku tirsê dilê hêzên dewletê bû, dewleta tirk qaşo ‘serkeftin’ a xwe îlan kir û bi teqandina fişekên hewayî ev yek pîroz kir.

Tirsa ji herêma ewle

MEMED DREWŞ

Serokomarê tirk Tayyîp Erdogan bi salan e ji bo koçberên Sûriyeyê, qala herêma ewle dike. Îdia dike ku vê daxwazê ji bo koçberên Sûriyeyê tîne ziman. Ji bo ev daxwaza wî bi cih were, heta niha gelek tişt kirin. Di hemû hevdiştinên diplomatîk de anî ziman.

Niha serokê nû yê DYA'yê Donald Trump jî, ji bo koçberên Sûriyeyê, qala herêma ewle kir. Ji bo vê daxwazê jî Pentagonê xwest ku, pro-jeyekê amade bike. Di rewşeke normal de, divê daxwazeke bi vî rengî Erdogan û rêveberiya tirk kêfxweş bike, ne wisa?

Lê rewş berovajî ye. Gotina Trump di serî de Erdogan, tevahiya rêve-beriya tirk aciz kir. Heta ew xistin nava panîkeke mezin. Erdogan tevahiya burokratên Wezaretê Karên Derve ya Tirk seferber kirin. Ev çend roj in hewl dide, rasterast xwe bigihîne Trump. Ji bo ku zû bi zû hevdiştinekê, heta bi telefonê be jî, bi Trump re biaxive hemû hêz û der-fetên dewletê seferber kirine. Ji bo vê ketiye rewşeke wisa ku ji cemaeta Fetullah Gulen jî pişt-giriyê bixwaze. Lê hemû hewldanên wî pûç derdikevin. Hemû daxwazên hevdiştinê û axaftina bi telefonê ji aliyê ekîba Trump ve tîst redkirin.

Sedema bingeîn a panîka Erdogan û dewleta tirk, kurd in. Erdogan û dewleta tirk dizane ku Trump bi gotina “herêma ewle” qala Rojava dike. Ji ber ku Trump jî dizane û dibîne ku niha Rojava hem ji bo kurdan û hem ji bo tevahiya Suriyeyê, yekana herêma ewle û aram e. Lewma senator, nûnerên meclisa nûneran, dîplomat û generalên amerîkî, bê parêzvan û bê tirs diçin Rojava. Bi tay-betî li kantonên Cizîr û Kobanê xwe di nava ewle-hiyê de hîs dikin. Ji ber vê, nûnerê serokê Amerîkayê yê tekoşîna li dijî DAIŞ'ê Brett McGurk gelek caran çû Rojava.

Sedemeke din a Erdogan û dewleta tirk xist nava panîkê jî, siyase-ta derve ya hemû dewlet û neteweyan, li ser bingeha ‘berjewendiyên netewî’ ye. Lewma ji kîjan alî ve dinêrin binêrin, berjew-endiyên DYA'yê, hevkarîya bi Rojava û kur-

dan re pêwîst dike. Ji ber ku DYA bê Rojava û kur-dan nikare hebûna xwe ya li Sûriyeyê bidomîne.

DYA ev yek bi xwe, bi dagirkeriya dawî ya tirk û pêkanînen li Şehbayê dît. Ew komên ku bi salan e perwerde û xwedî dikirin, li Şehbayê êrişî şewirmendên amerîkî kir. Li ber çavên leşker û şewirmendên amerîkî, ala DYA'yê şewitandin. Ên ev yek kir jî, ew çete ne ku ji dewleta tirk destekê digirin.

Helwesta Tirkîyeyê ya li Şehba û Babê guh nade hişyariyan û pêwîstiya sozan bi cih nayne, çavên DYA'yê vekirin. Di heman demê de DYA hinekî din nêzî şoreşa Rojava û tekoşîna kurdan kir. DYA'yê ev yek dît û dibîne. Li Sûriye û Rojava ancax bi kurdan dikare hebûna xwe bidomîne. Ne bi rejîma Suriyeyê, ne bi dewleta tirk, Erebiştana Siûdî, Qatar û ne jî bi aktorên din, nikare hebûna xwe ya li Suriyeyê û Rojava biparêze. Hebûna wê hebe jî, dê nekare bibe aktoreke bibandor. Yanî berjewendiyên netewî yên DYA'yê û hebûna wê ya li Rojava û Sûriyeyê, hevkarîya bi kurdan re pêwîst dike. Lewma ji aliyekî ve li Rojava baregehane çêdike, ji aliyekî ve çekan û ji aliyê din ve jî piştgiyariya hewayî dide hêzên HSD'ê. Heke bixwaze dikare wekî Încîrlîkê, li Rojava jî baregehekê çêke. Di rewşeke wisa de, dê bikare pêşîya şantaja Încîrlîkê ya dewleta tirk jî bigire.


A rast, îşaretên bi vî rengî jî hene! Lê ew ne mijara vê nivîsê ye. Ji ber ku rêveberiya tirk dibîne ku berjewendiyên netewî yên DYA'yê, bi hevkarîya Rojava û kurdan re pêkan in, ketine nava panîkê. Ji xwe pêşniyar-makeqanûna ku Rûsyayê ji bo Sûriyeyê amade kiriye, xewa Erdogan û rêveberiya tirk diherimîne.

Bi ser de, ji ber ihtî-mala Trump Rojava wekî herêmeke ewle îlan bike, Erdogan û rêveberiya tirk dîn û har bûne. Lewma rojek ji ya din zûtir, dixwazin xwe bigihînin serokê DYA'yê Trump ê wekî wan bazirgan e. Dixwazin hunera xwe ya bazirganiyê bi kar bînin û pêşîya ihtîmala Trump Rojava bike herêma ewle, bigirin. Lê ev bazirgan ne wekî bazirganên tirk e.



ROZA bi hejmara 11'emîn derket

KOVARA ROZAYÊ ya di sala 2014'an de bi du zimanan kurdî û tirkî dest bi weşana xwe kir û 3 mehan carekê wek kovareke çand, huner û wêjeyê tê weşandin, bi hejmara xwe ya 11'emîn xwe gihand ber destê xwendevanan. Kovar ji bo ku bibe dengê girtiyên siyasî jî li Enqereyê ji aliyê komeke xwendekarên kurd ve bi şiyara 'Huner lêgerîna heqîqetê ye' dest bi weşana xwe kir û bi piranî cih dide helbest, gotar û berhemên wêjeyî yên girtiyên siyasî. Di hejmara dawîn a kovarê de jî bi piranî nivîsên girtiyan cih digirin. Di hejmara dawîn a kovarê de bi tay-betî hevpeyvîna bi nivîskar Fatma Savci re ya bi salan di girtîgehê de maye balê dikêşe. Di bergê hejmara nû de berhema Luqman Ahmad ê ji Rojava yê di sala 2010'an de bi temaya 'Êzdayetiye' afirand, cih digire. **ENDERE**



Albuma nû ya hunermend Pinar Aydınlar a bi navê 'Gidenlerimiz Bêkes' lere derket. Aydınlar albuma xwe diyarî zarokê bi navê Bêkes kir. Bavê Bêkes di jêrzemînên wehşetê yê Cizîrê de ji hêla dewleta tirk ve hatibû qetilkirin



Albuma nû diyarî Bêkes kir

SADIYE ESER / STENBOL - DÎHABER

Hunermend Pinar Aydınlar piştî 6 salan bi albuma 'Gidenlerimiz Bêkes' lere derket pêşberî muzîkhezan. Aydınlar ev album di şexsê Bêkesê biçûk de diyarî hemû zarokên di êrîşên hovane yê dewleta tirk de li Kurdistanê hatin qetilkirin, kir.

Di albuma ku stranên bi tirkî, ermenî, hemşî, zaravayên kurdî yê kurmançî, kirmanckî cih digirin û rêveberiya albumê Îsmail İlknur kiriye û hunermendên wekî Gulden Akin, Muzaffer Ozturk, Onur Gugercinoglu, Tebo, Onder Karataş, Mehmet Kurt, Niyazi Koyuncu, Yilmaz Çelik, Kutsal Evçimen, Sezar Avedikyan û rojnameger Pakrat Estukyan piştigirî daye Aydınlarê.

GEZÎ Û PIRSÛS

Aydınlar di albumê de ji keça ermenî Gulê bigire xwe digihîne Behra Reş û heta salên 80'î yê

Cizîrê diçe. Aydınlar beriya Berxwedana Geziyê dest bi xebatên albume kiriye. Lê dema xebatên wê berdewam dikir Komkujîya Pirsûsê û qedexeya derketina derve li bajarên Kurdistanê pêk tî. Ev bûyerên pêk hatine di şewegirtina albumê de roleke mezin dilîzin. Aydınlar da zanîn ku taybetmendîya herî mezin a vê albume ew e ku li şûna paşnavê berê (Sas) paşnavê xwe bi kar tîne û wiha got: "Ev album di heman deme şoreşa min e."

Aydınlar çima navê albumê kiriye 'Gidenlerimiz Bêkes' lere wiha vedibêje: "Kî çi dibêje bila bibêje dê birîna Cizîrê neyê pêçandin. Ji ber wê me got ji Bêkesan re. Roja Orhan Tunç hat qetilkirin zarokê wî Bêkes hat dinê. Destpêkê navê wî kirin Bêkes û piştê vanê wî guhertin. Orhan Tunç, Mehmet Tunç û hevalên me yê din li ber çavê hemû cihanê hatin kuştin. Tu aliyên wê yê bîn efûkîrin tune

ne. Ji ber wê min xwe li ber Orhan Tunç û Mehmet Tunç berrisyar dît."

'BÊ KES NÎN IN'

Aydınlar li ser pirsê "gelo bi rastî bêkes in an jî we xwest peyamekê bidin" jî ev bersiv da: "Gelê kurd ne bêkes e. Zarokên Orhan Tunç bê kes nîn in. Çima bê kes nîn in, ji ber ku em hê jî nemirine. Hevalê me ne mirî ne. Dîroka berxwedêran hê jî nehatiye jêbirin. Dibe ku di malbatekê de 7-8 kes hatibin qetilkirin, mala gelek kesan xira bûbe, lê ciranên wan hatin û ji bo wan giriyan. Di vê bêkesiya heyî de ironiyek heye. Her wiha serokê Baroya Amedê Tahîr Elçî jî hat qetilkirin, me got 'Ew bê mirin in kesên diçin Sûrê. Dema em dibêjin Sûr Tahîr Elçî û dema dibêjin Tahîr Elçî Sûr tê bîra me."

Aydınlar aşkera kir ku strana ermenî jî ji ber ku soz daye hevalekî Hrant Dink, wê

straneke bi zimanê ermenî jî xistiye albumê û wiha pê de çû: "Rojnameger Pakrat Estukyan di xwendina stranê de alîkarî da me. Ji niha û pê de hindî jî destê min bê ez ê stranên bi zimanê din jî bixwinim."

QADA TÊKOŞINÊ

Aydınlar destnîşan kir ku qada muzîk û çandê qada têkoşinê ye û wiha axivî: "Ji bo strana 'Kolanên Cizîrê' hevalekî min ê derhêner ku mala wî jî li Cizîrê xirab bûbû got 'We stranek li ser Cizîrê çêkiriye, wek cizîriyekî ez dixwazim klîba wê bikişînim' kamerayên xwe girtin û hat. Em fikirîn me got li Stenbolê cihê ku herî zêde me rihet dike ku der e? Em fikirîn ku taxa Gazî ye, me li wir klîb kişand. Di demên pêş de dê bê weşandin."

Aydınlar dê di 12'ê sibatê de ji bo danasîna albumê li Navenda Çandê ya Bajar a Şişliyê konserekê bide.

Li ser Tahîr Elçî stran gotin

Hunermendên navdar Husnu Arkan û Erkan Ogur li ser serokê Baroya Amedê Tahîr Elçî strana bi navê 'Tutuşun' gotin. Serokê Baroya Amedê Tahîr Elçî li navçeya Sûrê ya Amedê li ber Minareya Çarling ji hêla polisên tirk ve hatibû qetilkirin û hê jî kujerê wî ji hêla dewletê ve nehatiye darizandin. Husnu Arkan agahiya stranê li ser hesabê xwe yê Facebookê parve kir û bi van hevokan hêstên xwe yê der barê Elçî de anîn ziman: "Di serî de Tahîr Elçî û hemû kesên ku ji bo xweşîkbûnê biparêzin jiyana xwe ji dest da." **AMED**



Fîlmê 'Çurên Birçî'

Serçe Memed (Yilmaz Guney), qaçaxekî dewletê ye û 'eşqiyayek' e. Dema mamostetiyê dike, hin çete bi ser gundê wan de digirin û hevîna wî direvînin. Hevîna wî piştî 9 mehan li çiyê tê girtin, dawî li jiyana xwe tîne û cenazeyê wê tînin gund. Serçe Memed ê li gundekî Sêrtê mamostetiyê dike, li vê herêmê navê wî derdikeve 'Celladê Eşqiyayan'. Dîsa rojekê hin çete hevîna mamostetiyê direvînin û 3 mehan li çiyê ev jin rastî îstismara van çeteyan tî. Serçe Memed vê jinê rizgar dike û dibe mala hevîna wê. **AMED**



Fîlmê derhênera kurd li Mîhrîcana Goteborgê ye

MURAT KUSEYRÎ / STOCKHOLM

Fîlmê 'Drom vidare' (Xeyala xwe bidomîne) ya derhênera jin a kurd Rojda Şekersoz, di 40'emîn Mîhrîcana Fîlman a Goteborgê de, wek namzeta xelata mezin a 'Dragon Award Best Nordic Film' ku wek Xelata Ejderha tê naskirin, hat nîşandin.

Rexnegirên sinemayê diyar kir ku ji bo Şekersoz xelata ku buhayê wê bi milyonekî ye bigire, divê bi fîlmê Xwîna Samî a derhêner Amanda Kernell û fîlmê Tom Of Finland a derhêner Dome



Karukovskî re tê bikoşe û ji wan derbas bibe.

Fîlmê 'Drom vidare' qala pirs-girêk, zor û zehmetiyên ciwanên koçber ên ku ji derveyî pergale hatine hiştin, dike. Her wiha dest-nîşan dike ku ji bo pêkhatina xeyalan û çareserkirina pirs-girêkan, divê ciwan li ber xwe bidin û tê bikoşin.

Du wateyên gotina 'Drom vidare' hene. Yek jê: 'ji bo pêkanîna vîzyona xwe, xeyalên xwe bidomîne' ku ev wateya xwe ya erênî ye, ya din jî: 'tu dikarî tenê di xewn û xeyalan de bibînî' ku wateya wê jî êş û elem e.

Derhênera jin Rojda Şekersoz yek ji rêveberên Komîteyên Rojava û Bakur e ku ji bo piştigiriya ji rojava û bakurê Kurdistanê dixebite. Di heman

demê de, di nava komeke helbestên siyasî ya bi navê 'Revolution Poetry' de bi rengekî çalak dixebite. Di Şanoya Dramayê ya Kraliyetê de, di xwepêşandana li dijî dijminahiya li biyanîyan û nijadperestiyê, li qadan helbestan dixwîne.

40'emîn Mîhrîcana Fîlman a Goteborgê êvara inê dest pê kir û dê 11 rojan bidome. Di nava van 11 rojan de dê ji 84 welatan 457 fîlm bîn nîşandin.

'Dîroka Alternatîf a Kedê' derket

Ji Weşanxaneya Amarayê pirtûkeke nû xwe digihîne ber destê xwendevanan. Pirtûka 'Emegîn Alternatîf Tarihi - İşçi Denetimi ve İşyeri Demokrasisi' (Dîroka Alternatîf a Kedê- Venihêrtina Karkeran û Demokrasiya Kargehê) a ji aliyê Dario Azzellini ve hat amadekirin, dê vê hefteyê xwe bigihîne xwendevanan. Di pirtûkê de nivîsên der barê komunizma konseyê, anarko-sindikalizm, operaîsmoya îtalyanî û nivîsên 'heretîk' ên der barê Komuna Parîsê de cih digirin û her wiha balê dikêşe ser sepanên û armancên tevgerên karkeran ên otonom ên dîrokî û hemdem.

Dario Azzellini yê balê dikêşe ser pirsên girîng, di pirtûkê de mayînbûn û pêşbîniya ku dê cihên kar çawa îstîqrarekê li civatan bide peyda kirin û dê xweseriyê çawa pêk bîne, destnîşan dike. Pirtûk, mayînbûna cihê kar a karkeran û bi vegotina demokrasiya beşdarî dê çawa civatên xwe stabîlîze bikin, nîşan dide.

Pirtûk ji 10 beşan pêk tê, beşa wê ya ewil ji aliyê Alex Demirovic ve hatiye nivîsandin. Demirovic beşa ewil bi sernavê 'Demokrasiya Konseya Marks an jî Dawiya Hêla Wî ya Siyasî' nivîsandîye. Beşa duyemîn bi sernavê 'Kîza Hevîdem û Venêrîna Karkeran' ji aliyê Dario Azzellini ve hatiye nivîsandin. Her wiha dîsa gelek beşên din di pirtûkê de cih girtiye. **AMED**



Planê neweyî dewre de yî



■ SEYÎT EVRAN

Wexto ke merdim doneyê ke demê peyênan de vejîyenî orte, îzehet û gamê ke yenî eştîş ra ewnîyeno, vînenno ke derheqê Rojawan û Sûriyeya Vakûrî de planê neweyî erziyayî dewre. Awankarê nê planan zî Tirkîya yanî AKP yo. Endamê MÎTî û kurdê hemkarî miyanê nê planan de cayê xo gênî. Her çiqas ke bi hawayo zelal dîyar nêbo ke Rûsya kura de ca gêna, la miyanê planan de aye zî esta. Tirkîya planê xo Rûsya ser ro dana meşnayîş.

Dawetbîyayîşê tayê şexsan yê Kombîyayîşê Astana û munaqeseyê erşawiyayîşê 'Pêşmergeyê Rojawanî' nîşanê ma danî ke derheqê Rojawanî de planê neweyî dewre de yî û Tirkîya wazena şerê birayan Rojawan de bida destpêkerdiş

PARÇEYÊ PLANÎ

Parçeyo yewin yê planî Kombîyayîşê Astana ke kombîyayîşê Moskovayo 20ê kanûne de hetê Rûsya, Îran û Tirkîya ra amebî viraştîş ra dima virazîya, ewja de vejîya orte. Temsîlkarê siyasî, îdarî û leşkerî yê şaranê Sûriyeya Vakûrî nêameyî dawetkerdiş. Tena bi nêyî zî nêmendî. Herinda înan de kesê ke verê cû miyanê ENKSyî de ca girewtênê û nika qet şik çin o ke endamê MÎTê Tirkîya yî, kesê sey Îbrahîm Biro, Sîyabent Haco, Fuat Alîko, Hekîm Beşar û sewbîna kesî ameyî dawetkerdiş. Dawetbîyayîşê nînan tayê bo zî derheqê planan de zanayîş dano merdimî. Çimkî ti giraniya



nê kesan Rojawan de çin o. Tena Rojawan de nê, çar parçeyê Kurdistanî de û teberê welatî de zî miyanê kurd û Sûriye de ti kes nînan goşdarî nêkeno. Hêz û îradeyo ke temsîl kenî çin o.

Labelê nînan ra Fuat Alîko vejîya, aşkere kerd ke ê seba kombîyayîşî ameyî dawetkerdiş. Nê kesî rojêk verê cû hetê Selahîyetdarê Karê Teberî yê Tirkîya ra vengdîyayî û înan reyde ame qiseykerdiş. No qiseykerdişî ra dima Îbrahîm Biro îzehetêk dabî û vatbî 'ma do Kombîyayîşê Astana de çîyê ke PYD kerdî, biyarî ziwan.' Teberê nê kesan de sewbîna ti kesê ke wayîrê nasnameyê siyasî yî, nêşîyî. Nêyî zî seba rotişê kurdan şîyî.

Yê ke vengdîyayî Astana, heme zî grûbê sîlehîni yê Birayê Misilmanan bî. Raştîya xo de merdim eşkeno vajo ke no kombîyayîş, dibarekerdişê kombîyayîşo ke par Rîyad de ame viraştîş o. Kombîyayîşê Rîyadî de teberê Cephayo Sûnî de ti qerar nêvejîyabî û nê kombîyayîşî ra dima şero miyanên yê Sûriye hîna zî kûr bibî.

NEWE RA AME ROJEVE

Parçeyo diyin yê planî, munaqeseyê ke derheqê der-

bazkerdişê 'pêşmergeyê Rojawanî' ke raştîya xo de pêşmergeyê PDK yî yê Rojawanî de yenî kerdîş î. Îdarekarê ENKSyî Kawa Azîzo ke heta nika Hewlêr ra nêvejîyayo û verê cû pesnê rejîmê Sûriye dabî, îzehet dano û vano 'ma do artêşa Kurdistanî biruşnê Rojawan'. Xora çend rojî verê Îbrahîm Biro, Fuat Alîko, Sîyabent Haco yî selahîyetdarê Fransa, Avusturya, Danîmarka, Hollanda, Îtalya û sewbîna reyde pêvînayîş kerdîbî. Îxtîmalêko gird Tirkîya bi xo nê pêvînayîşan eyar kerd.

Xora Sîyabent Haco yî nêyî îtiraf kerdîbî. Labelê pêvînayîşê ke Danîmarka, Hollanda, Avusturya û Îtalya reyde kerdîbî, nê pêvînayîşan de selahîyet-daranê ê welatan nê kesan ra bi hawayo aşkere vatbî ke çîyo ke sey pêşmergeyê Rojawanî çin o û pêşmergeyê ke qala înan yena kerdîş, pêşmergeyê PDK yî.

Hemsereka Meclîsê Sûriyeya Demokratîke Îlham Ehmede û Hemserekê Têkilîyê Teberî yê Kantonê Cizirî Abdulkarîm Omerî na raştîye aşkere kerdîbî. Her çiqas ke rewş wina ya zî newe ra ardîşê rojeve nîşanê merdimî dano ke wazenî planêk bierzî dewre.



AMADEKARÎ KENA

Dagîrkerîya Cerablusî ya Tirkîyaye ra dima reyna derbazbîyayîşê pêşmergeyan ame rojeve. Heta ge-ge derheqê derbazbîyayîşê pêşmergeyan de zanayîşî zî vila biyî. Rojanê peyênan de ame vatîş ke Cerablus de tayê cayan de beyraqê pêşmerge ameyî aliq-nayîş û no derheq de tayê zanayîşî zî vila biyî. Îcab nêkerdêne ke pêşmergeyî Başûr ra derbaz bibî, çimkî no het de demêko derg o yê ke seba nêyî Şehba de fealiyet meşnayêne, estbî. Nê kesî zî xora miyanê hêzanê 'Firat Kalkani' ke hetê grûbê Sultan Muradî û grûbanê bînan ra ameyêne kerdîş de ca girewtênê. Nînan ra yewe dewa Şiverînî ke girêdayeyê Raî ya ra

Mahmut Hamoyo ke sey Ustaz Mahmut yeno zanayîş o. Mahmut Hamo endamê awankarî yê grûbê Selahattîn û Azadî ke dormeyê Helebî de amebî awankerdîş û pratîko sifteyîni yê înan hêrîş berdişê taxa Eşrefîye ser de bî. Yê bîni zî kurdo ke bi nameyê Mahmut Xeloyo Qibbesînî ra yo. Xelo zî sey Hamoyî awankarê grûbê Azadî û Selahattînî yo. Hetta wexto ke hetê Tirkîya ra wezîfeyê komkerdişê grûbanê kurdan dîyabî berpirsiyarê grûba Nurettîn Zengîyî Şêx Tevfîkî, o wext pêşmergeyî do fermandariya Xeloyî de biameynê erşawitîş, wina amebî plankerdîş. Labelê dima ra plan nêbibî û rîyê rastikên yê Şêx Tevfîk Şehabettînî vejîyabî orte.

Nê kesan rê miyanê grûbanê Sultan Murad, Firket El Hemze û sewbîna de wezîfeyê berzî ameyî dayîş û bi no hawa nika ra bi hawayo fîlî rêx-istinkerdîşê hêzê pêşmergeyê Rojawanî ameyo kerdîş. Heto bin ra 2 serrî verê grûbêka çeteyan ya bi nameyê Ketîbeyî Baz de bi Ustaz Mahmut (Mahmut Hamo) dabî awankerdîş, nika zî bi çete û endamanê MÎTî hewl danî na grûbe hîna qewetin bikerî. Çîyo ke Kawa Azîzî vano aktîfk-erdîşê nê çeteyan û zêdekerdişê nê çeteyê ke hetê MÎTê Tirkîya ra amebî perwerdekerdiş ra vişêr çîyêk nîyo. Eke wina bibo, o wext bi destê Tirkîya û kesê ke hetê MÎTî ra ameyî resnayîş, do şerê birayan bidîyo destpêkerdiş.

Na rewşe do rojê ameyoxe de hîna zelal biba. Ya kesê ke nika vanî ma ser nameyê kurdan qisey kenî û şerê birayano ke hetê MÎTê Tirkîya ra wazîyeno bidîyo destpêkerdiş ferq bikerî û şaşîya xo ra peyser biagêrî yan zî na rey şaranê Sûriyeya Vakûrî nê, do heme kurdan vera xo de bivînî. Çimkî kurdî firsendê yew-bîyayîşî ke bi Kongreya Neteweyî zaf nîzdiyê ci biyî, nêwazenî nê firsendî yewna rey biremnî.

Cayê qerargehî yeno dîyarkerdiş

NÊ KESÊ ke miyanê Tirkîya de hetê dewleta tirk ra yenî resnayîş û seba ke şerê birayan bidî destpêkerdiş erşawiyenî Rojawan, Tirkîya seba nê kesan amadekarîya viraştîşê qerargehêk zî kena. Dewa Tel Cîbrîna ke girêdayeyê Şehba ya de Tirkîya 10 rojanê peyênan de seba ke qerargeh awan bikera, xebatan dana meşnayîş. Dewa Tel Cîbrînî corê dewa Ayn Deko ke destê Artêşa Devrîmcîlerî de ya û tewr zaf raştê hêrîşan yena de ya, reyna vakurê Azezi de ya. Hedefo esasîni yê qerargeho ke Tirkîya wazena Tel Cîbrînî de awan bikera, herêma Şehba yo. No hedef planê ke bi munaqeseyê ke bin nameyê 'Pêşmergeyê Rojawanî' de dîyayî destpêkerdiş zî aşkere kenî. Bi no hawa hedefê dawetkerdişê kesê sey Îbrahîm Biro, Fuat Alîko, Sîyabent Haco û sewbîna û destpêkerdişê munaqeseyê erşawitîşê Pêşmergeyanê Rojawanî bi hawayo zelal yeno famkerdiş.



Ma hesreta
dayîka xo
ancenî

Qezaya Nisêbînî ya Mêrdînî de 14ê kanûna 2015 de reya 6. qedexeyê teberve-jîyayîşê kuçeyan amebî îlankerdiş û 20ê kanûne de zî taxa Gîrnavasî de cinîya bi nameyê Emîre Goke ameye qetilkendiş. Şahidê hedîseyî vatbî e polîsê ke Cadeyê Îpekoyolu de bica bibî, bi hawayo bêkontrol dormeyê xo ser de gule reşanaybî û Emîreye zî bi hawayo zanayîş qetil kerd bî.

Keyeyê Emîre her çiqas ke derheqê hedîseyî de doze akêrd, heta nika kerdoxî nêameyî dîyayîş. Babete ser o kênaya Emîre Basra Goke qisey kerde.

Basra Goka ke wexto ke dayîka aye ameye qetilkendiş hetê dayîka xo de biye, wina va: “Ez wazena kesê ke dayîka mi qetil kerd wa bêrî mehkemekendiş û ceza bidîyo inan.”

MIN NÊZANAYÊNE MERDA

Basra Goke dewamê qiseykerdişê xo de va ‘wexto ke gule dayîka mi gîna, ma nêzana ke se bikerî’ û wina dewam kerde: “O wext ez wina cemedîyaya. Tayê guleyî mi ser de zî ameyî. Wexto ke vengê guleyan birîya, mi çend kesê ke teber de bî ra waşt ke wa veng bidî ambulans. Mi nêzanayêne ke dayîka mi merda. Cayo ke guleyî gînaybî gonî daxî nêameynê.”

MA ZAF BÊRÎYA AYE KENÎ

Basra peynîya qiseykerdişê xo de wina va: “Mergê dayîka mi ser ro serrêk derbaz bî. Ma zaf bêrîya aye kenî û hêrsê ma nêqediyeno. Ez ti xi xo bi xo persena. Dayîka ma şîye, pîyê mi doze akêrd. Ez nêzana ke doze çi merhale de ya? Çend guleyê ke keyeyê ma gînaybî, polîsan ma ra girewt, çendê bînan zî ma avûkat. Labelê ma hema zî netîce nêgirewto.”

MÊRDÎN - ŞÛJIN



Ganî ma pîya têbigêrî

Sereka Pêroyî ya EMEPî Selma Gurbane derheqê prosesê referandûmî de qisey kerde û wina va: “Ganî hêzê demokratîke platformêko ortax awan bikerî. No platform û pîya tégêrayîş do seba her kesî hîna xêrin bibo”

SEDA TAŞKIN / ANKARA - DÎHABER

Pêşniyazê bedilnayîşê qanûno bingeyî bi reyanê AKP û MHPyî meclîs ra derbaz bî û erşawîya Serekkomarî ver. Eke Serekkomar Erdogan tesdîq bikero, o wext do prosesê referandûmî dest pêbikero.

Sereka Pêroyî ya Partiya Kede (EMEP) Selma Gurbane babete ser o qisey kerde.

Gurbane va ‘weçinayîşê 7ê Hezîrane ra dima AKP seba ke îqtîrê xo bipawo, îradeya şarî nêşinasna û îxtîmal esto ke prosesê referandûmî de zî wina bibo’ û wina domnaye: “Hukmat kaos, şiddet û şerî ser ro siyaseta dano meşnayîş, lejo ke wextê pêvî-nayîşê bedilnayîşê qanûno bingeyî de vejîya zî do prosesê referandûmî de raybazêko senî bêro xebetnayîş, bi hawayo zelal nîşanê ma bido.”



MUXALÎFÎ TEPIŞÎYENÎ

Gurbane dewamê qiseykerdişê xo de va ‘seba xebatê AKP û MHPyî heme îmkanê dewlete yenî seferberkerdiş, la seba mux-alîfan destûr daxî nêdîyeno’ û wina dewam kerde: “Yê ke taxan de kampanyaya ‘nê’ danî meş-nayîş, yenî tepîştîş û raştê şiddetî yenî. Çalakî û aktivîteyî hetê wali û qeymeqaman ra yenî qedexek-

erdiş. O wext ma do senî şêrî şarî ra vajî? Nika Hemserekê HDPyî zî tede xeylê parlamenter û bi hezaran kesî tewqîfkerde yî. Ma na rewşê qebl nêkenî.”

NÎŞANEYÊ NÊYÎ ESTO

Gurbane dîyar kerde ke ‘ma bi mektuba vengdayîşî ke seba kark-eran nuştîbî, dest bi xebatan kerd’ û wina va: “Wezîfeyê ma no yo ke no bedilnayîşê qanûno bingeyî yeno çi mana, ma bi şar bidî famkerdiş û şarî reyde bi xebatanê ortax bikerî û hêzêko gird vejî orte. Eke rewşêka provakatîfe nêvejîyo orte, do netîce de ‘nê’ qezenc bikero. Xora eke ‘nê’ qezenc bikero, meseleyo esasî do o wext dest pêbikero. Çimkî o wext persê ‘ma wazenî Tirkîyayêka senîn de bicuyî?’ vejîyeno orte. Yanî o wext wezîfeyê ma newe dest pêkeno.”

KEWENO MILÊ MA SER

Gurbane peynîya qiseykerdişê xo de va ‘hukmatê AKPyî hêrişê muxalîfan keno û HDPyî zî bi rêxistinanê terorî reyde şînase keno’ û qiseykerdişê xo wina qedênaye: “Ganî vera nê nîzdîy-bîyayîşê hukmatî de CHP û HDP bêrî têhet û pîya hereket bikerî. Ganî CHP no het de nêvajo, ‘AKP do se bikero û derheqê mi de çi vajo’ ganî seba aşî û demokratîkbîyayîşê nê welatî rayîrê pîya tégêrayîşan bigêro. Çimkî lazimîya welatî seba azadî û demokrasi esta û no het de berpirsîyarîya ke kewena milê ma yê hemînan esta. Eke netîce de ‘nê’ qezenc bikero, do vernîya Tirkîya biabo. Seba averşîyayîşê têkoşînê demokratîke ganî hêzê demokratîke pîya hereket bikerî. Çimkî pîya hereket kerdîş, seba ma hemînan do hîna zaf xêrin bibo.”

OHAL de îxlalê heqê
domanan zêde bîyo

MELEK YUKSEL / AMED - ANF

Weçinayîşê 7ê hezîrane ra dima Tirkîya de politîkayê şer û rijnayîşî dîyayî destpêkerdiş. Bitaybetî teşebusê derbe ra dima bi îlankerdişê OHALî nê politîkayî vejîyayî dustê tewr berz û nêyî ra girêdaye îxlalê heqan zî zêde bîyo. Mîyanê nê îxlalan de îxlalê heqê domanan xeylê zêde yo.

Babete ser o Endamê Komîsyonê Domanan yê ÎHDyî yê Şûbeyê Amedî Avûkat Ercan Yilmazî qisey kerd.

Yilmazî qiseykerdişê xo de va ‘raporê ke hetê ma û hetê rêxistinanê sîvîlan ameyo amadekerdiş de yeno dîyayîş ke prosesê pêro-dayîşin de îxlalê heqan xeylê zêde bîyo’ û wina domna: “Bitaybetî bi qedexeyê tebervejîyayîşî ke ameyî îlankerdiş, hetê cuye, weşî, perwerde û sewbîna hetan de heqî ameyî îxlalkerdiş. No proses de bi seyan hedîseyê îstîsmarî ameyî cuyayîş. Dîmenê ke Sûr de vejîyayî orte de zî ame dîyayîş ke domanê ke bi keyeyanê xo Sûr ra vejîyayêne senî raştê îstîsmarî ameyêne.”



HEWL DANÎ PADÎ

Yilmazî dewamê qiseykerdişê xo de va ‘derheqê dozê îxlalê heqê domanan de prosesê mehkeme bi zanayîş bi hawayo giran yeno meşnayîş’ û wina dewam kerd: “Nêyî ver êdî keyeyî nêeskenî dozan taqîp bikerî. Seba ke her ronîştîşê mehkeme de keye û kesê ke îstîsmar kenî yenî têrî, tayê keyeyî wazenî ke wa doze bêro padayîş. Mesele dosyaya Helîn Şene ser ro her çiqas ke 17 aşmî derbaz biyî zî hema zî tehqîqat nêdîyayo destpêkerdiş. Reyna dozê domanê ke Sûr ra vejîyayî de zî eynî çî esto. Her çiqas ti delîl destî inan de çin o zî 10 aşmî yo ke nê domanî tewqîfkerde yî. Dergbîyayîşê mehkeme beno sebebê probleman.”

Seba çareserî
proje lazim o

NAZIM DAŞTAN / KOBANÊ - DÎHABER

23ê çileyî de paytextê Kazakîstanî Astana de bi organizatoriya Rûsya, Îran û Tirkîya de kombîyayîşê ame viraştîş. Her çiqas ke kombîyayîş hesaban ra seba çareserkerdişê krîzê Sûriye ame viraştîş, seba ke muxatabê bingeyî yê Sûriye nêameyî dawetkerdiş, kombîyayîş bê netîce peynî bî.

Babete ser o Endamê Komîteya Rêxistinbîyayîşî yê Federalîzmê Demokratîke yê Sûriyeyê Vakuî Ferhat Dêrik qisey kerd.

Dêrikî va ‘kombîyayîşo ke bêro viraştîş, ganî çareserî hedef bigiro. Kombîyayîşê ke seba sewbîna hedefan bêrî viraştîş, do netîce nêgîrî’ û qiseykerdişê xo wina domna: “Ganî heme hêzê ke teberê terorî de yî, beşdar bibî, la Astana de wina nêbî. Pêvînayîşê Astana de Rûsya hewl daye ke hîna zaf Tirkîya bigiro bin kontrolê xo. Grûbê ke beşdarê kombîyayîşî biyî, bi politîkayê Tirkîya ke Sûriye de îflas kerd bî, beşdar biyî. Heto bîn ra waştênê ke HSDyî bigirî listeya terorî.”

GANÎ PROJE BIBO

Dêrikî dewamê qiseykerdişê xo de va ‘Pêvînayîşê Astana ra dima Rûsya PYD, MSD û temsîlkaranê bînan dawetê Moskova kerde’ û wina dewam kerd: “Êdî inan zî fam kerd ke bê temsîlkarê Sûriyeyê Vakuî çareserî nêbeno. Tena Rûsya nê, Amerika zî wina fikiryena. Astana de çiyêko bîn vejîya orte; 3 dişmenê yewbînan yê tarîxî Rûsya, Îran û Tirkîya ameyî têhet. No têhetameyîş beno ke çiyê dem demî bîyaro, la çiyêko mende nêano. Seba ke Sûriye de çareserîyêka rastikêne bivejîyo, ganî heme hêzê siyasî û leşkerî ke welat de yî bêrî têhet. Ma DAİŞ, El Nusra û Ehrar-El Şamî teberê neyî de vînenî. Reyna seba çareserî ganî projeyêk bibo. No proje zî politîkayanê hêzê teberî nê, ganî qezencanê şarî esas bigiro.”



Bi hezaran nexweşan derman dike

İBRAHİM EHMED / GİRÊ SPÎ – ANHA

Piştî ku bajarokê Silûkê yê roj-hilatê bajarê Girê Spî hat rizgar-
kirin, şêniyên bajarokî
vegeriyan warên xwe û ji nû ve
dest bi avakirina bajarokê xwe
kir. Şêniyên Silûkê bi alikariya
Komîteya Tenduristiyê ya Rê-
veberiya Xweseriya Demokra-
tîk a Girê Spî di serî de

Navenda Tenduristiyê ya Si-
lûkê ku ji aliye çeteyên
DAİŞ'ê ve wek baregeha lêş-
kerî hatibû bikaranîn, vekir.
Bijîşkên nexweşiyên hundirîn,
nexweşiyên giştî, nexweşiyên za-
rokan û nexweşiyên jinan, li na-
vendê saet ji 08:00'ê sibehê heta
14:00'an nexweşan tedawî dikin.
Li navendê dermanên îltîhab,
serma, birîn û şewat, laşmanya
(rîş) û derzikirina zarokan hene.
Lê ji ber ku dermanên heyî têra

Nevenda Tenduristiyê ya Silûkê
ku bi alikariya Komîteya
Tenduristiyê ya Rêveberiya
Xweseriya Demokratîk a Girê
Spî hat aktîfkirin,
**heta niha bi hezaran
nexweş lê hatine
dermankirin**

nexweşan nakin, pêdiviya na-
vendê bêhtir bi dermanan heye. Li
gel derfetên kêr ji li navendê di 3
mehên dawîn de 2 hezar û 50 nex-
weş ji bajarok û gundewarên wê
hatin dermankirin. Li aliye din bi-
jîşkên navendê nexweşên giran ên
ku tên ber destê wan jî radikin
nexweşxaneyê El Wetenî ya ba-
jarê Girê Spî.

DERMAN PÊWÎST IN
Endamê Rêveberiya Navenda



Tenduristiyê ya Silûkê Dr. Ehmed
Elî der barê xizmeta navendê de
axivî û diyar kir ku nexweşiyên
wekî kolera, laşmanya û hin nex-
weşiyên din li navendê tene der-
mankirin. Dr. Elî da zanîn ku
nexweşên ku nexweşiyên wan



giran bin, dişînin nexweşxaneyê
El Wetenî ya bajarê Girê Spî.
Dr. Elî destnîşan kir ku pê-
wîstiya navendê bi dermanên
zexta xwînê, şeker, nizmkirina
pileya germê û yê sernayê
heye. Her wiha Dr. Elî got ku



pêdiviyên xwe yê navendê ji
Komîteya Tenduristiyê ya ba-
jarê Girê Spî werdigirin û axaf-
tina wiha bi dawî kir: “Rojane
zêdetirî 80 nexweş serlêdana
navendê dikin û li gorî derfetên
li navendê tene dermankirin.”



Zivistan û bêderfetiya helebîyan

SİLVA MISTEFA / HELEB – ANHA

Demsala zivistanê rewşa
şêniyên taxa Şêxmeqsûdê
ya Helebê ya di bin dor-
pêça komên çete de dij-
wartir kir. Şêniyên taxê ji
ber sernayê zêde û derfe-
tên kêr gelek zehmetiyê
dikêşin û bi tîbûn û birçî-
bûnê re rû bi rû ne. Rêxis-
tinên mirovî yê
navneteweyî li gel vî yekê
jî bi tu awayî ji şêniyan re

nabin alîkar.

Welatiya ji taxê ya bi
navê Horiye Mihemed di-
bêje ji ber derfetên kêr, tiş-
tek tune ye ku pê xwe ji
sermaye zivistanê biparêzin
û wiha got: “Zarokên min ji
ber sernayê nexweş ketine,
min ew birin navenda tendu-
ristiyê, lê derman tune bû.
Divê rêxistinên mirovî dest-
tekê bidin me.”

Welatiya bi navê Zeyneb
Bîlal jî qala zehmetiyan kir

û êşa xwe wiha anî ziman:
“Di vî sernayê de ne êzing,
ne ji mazot heye ku em xwe
li ber germ bikin. Di saatên
sibehê de em xwe didin ber
tavikê. Lê êvaran tiştek tune
ye me ji sernayê biparêze.”

Her wiha welatiyê bi
navê Mihemed Hesen jî bê-
dengiya Neteweyên Yekbûyî
û raya giştî ya li hemberî
rewşa ku şêniyên taxê tê re
derbas dibin, şermezar kir û
banga alîkariyê li wan kir.

Kurdistan di bin berfê de ma



Ji ber barîna berfa zêde di serî de Amed û bajarên din ên Kurdis-
tanê di bin berfê de man û bi sedan rêyên gundan hatin girtin.
Li gorî agahiyên hatin bidestxistin li navçeya Çînarê 7 û li nav-
çeya Pasûrê jî 45 gund, rêyên wan jî ber barîna berfa zêde
hatin girtin û tîkiliya bi wan re hat birîn. Li bajarê Xarpêtê
383, li Dêrsimê 248, li Çewlikê, 278, li Mûşê 365, li Bedlîsê
312, li Qersê 151, li Sêrtê 180 û li Êlihê jî 565 gund û gundîk jî
ber barîna berfa zêde rêyên wan hatine girtin. Her wiha li Erzi-
rom, Erdexan, Şîrmex, Mêrdîn û Colemêrgê jî rêyên bi sedan
gundan jî ber barîna berfa zêde hatin girtin. **AMED**



Aboriya xweser a jinan bi pêş dixin

Jinên rojavayî bi kedeke mezin
aboriya xwe ya xweser bi pêş dixin
û gelek berhemên xweşik di-
afirînin. Jinên Efrînê yên ku li kan-
tona Cizîrê bi cih bûne, karê rîs û
patîkan dikin û berhemên xwe li
bazara gel a Qamişloyê difiroşin.
Ferîde Mihemed Xelîl da zanîn ku
ew ji bo debara xwe dixebitin û
wiha got: “Tenê rojên yekşem,
duşem û pêncşem saet ji
08.00'an heta 12.00'an berhemên
ku me bi dest û keda xwe
çêkirine, em derdixin bazareke gel
û difiroşin.”

Ferîde Xelîl da zanîn ku keçên
wê jî li malê alîkariya wê dikin û
wiha pê de çû: “Keçên min
alîkariya min di karê rîs û hûnand-
ina patîkan de dikin. Ev berhem li
hemû bazaran nayên firotin, tenê li
hin bazaran tê firotin. Em rojekê bi
çêkirina goreyekê ve dimînin, lê bi
buhayekî erzan difiroşin.”

HÊVÎDAR IN

Xelîlê bal kişand ser desthilat-
dariya ku li ser jinan tê meşandin û
ev tişt anî ziman: “Bi hezaran salan
e ku jin di nav civakê de ji mafê xwe
bê par hatine hiştin. Di aliye
xwendin û kar de jî ev bêparbûn li
ser jinan dihate ferzkirin. Em di
rojên pir zehmet re derbas bûn. Lê
hêviyên me hene ku nîşke nû û
jiyaneke xweştir bê avakirin.”

ÇANDA DAPÎRAN

Welatiya bi navê Fatma Ehmed jî
da zanîn ku wan pêdiviyên xwe yê
wekî morik û tayê rîs berê ji bakûrê
Kurdistanê peyda kirine û wiha got:
“Ji ber ku rê girtî ye, em niha bi
rîsên kevn ên li gel me mane
berhemên xwe çêdikin.” Ehmed anî
ziman ku li gel zor û zehmetiyan jî,
ji ber ku ew çanda dayik û dapîrên
xwe didomînin, gelekî kêfxweş in.
QAMIŞLO - ANHA